

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 52 | zivistan | 2012



Sohbetek bi İbrahim Gürbüz re
Mala me mala we ye, Wan
Kon û qonax
Mercedes û nasnameya kurd
Medyaya kurdî û nimûneyek ji tesîra wê

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB
Hejmar 52, zivistan 2012
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Edîtor: Ali Ciftci, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma redaksiyonê
Ali Çiftçi, Dr. Mîkaîlî, Heci Erdoğan, Mehmet Bayrak, İhsan
Türkmen, M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Seyfi Doğan,
Vahit Duran, Mem Xelîkan, Mustafa Mîh, Özgür Kara û Yusuf Polat

Adress: Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post: info@birnebun.com
Internet: www.birnebun.com

Têkili/İlişki
Danimarka: İrfan Baysal, 0045-27 11 58 83
Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294
Amerika: Mam Recall, mamoste.kart@yahoo.com

Belavkirin / Dağıtım
Ewropa: Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyay
Tfn: 0049-172 298 24 51

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı: Europa: 5 Euro • Türkiye: 3 YTL

Abone
Swêd: 400 SEK • Almanyay 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası: (Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap/Baskı: Apec-Tryck AB

Wêneya li bergê: "Kolaj", 97x77cm, li ser caw
Hunermend: Bekir Dari



Zarokên ji konên goçberên li gundê Încovê, havîna 2011an
Wênekêş: Nesrîn Bayram

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn, serrast û
kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegevandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok/İçindekiler

4	52
Ji bîrnebûnê	Du helbest
Ali Çiftçi	Mem Xelikan
9	53
Sohbetek bi İbrahim Gürbüz re	Asîmîlasyon û serhildana min
Ali Çiftçi	Muzaffer Özgür
17	57
Kon û qonax	Cuciyê serî kênî çûlê
Nesrin Bayram	Xamgelî Bane
19	64
Melayê meyxwur	Li koka xwe bigere
Yılmaz Çamlıbel	Ali Çiftçi
30	66
Perdeya xeyalên tazî	Mercedes û nasnameya kurd
Xizan Şîlan	Ecevit Yıldırım
32	71
Şopên dema xatirxwaztinekê	Hoydar
Nuh Ateş	İbrahim Korkmaz
44	72
Bêdengiyeke bêdeng	Modanlılar
Seyfi Doğan	Enver Yurtdaş
46	77
Rojên teng û parvekirî	Dersim Katliamında Gerçekler ve Düzmece Senaryolar
Mem Xelikan	Mehmet Bayrak
48	83
Payîzî	Ji weşanên nû
Seyfi Doğan	

Ji bîrnebûnê

Destxistina nîrxên demokratîk û mafên însanî ji bo her mîletekî ne hêsan bûye. Di dîroka hemû mîletan de ji bo vê, bedelên giranbûha û tekoşînên bêwestan hatine dayîn. Heta ku însan li ser rûyê vê dunyayê hebin tekoşînên ji bo jiyaneke bi rûmet ê her berdewam bin. Li Rojhilata Navîn, herçiqas hinek bûyerên ku meriv ne li bendê bû ji rûdan, nimûna tekoşîna li meydana Tehrîrê li Misîrê, bi rastî ji bo rêya demokratîk, di dîrokê de cîyekî mezin girt.

Li welatê me jî mixabin ev hêviya ji bo jiyaneke aram piştî komkujiya 35 ciwanên gundê Roboskiyê li navçeya Qilobana Şîrnexê, di arîfeya serê salê de hat şikandin û gelê kurd dawîya sala 2011an dîsan bi dilkeştî û xemgînî derbas kir.

Em li vir jî hemû gundiyên Roboskiyê û bi taybetî jî ji malbatên dilkeştî re dibêjin: serê we sax be! Êşa we, êşa me ye jî. Bîrîna we bi tu awayekî maddî nayê derman kirin. Ev komkujiya dê tu carî neyê jibîrkin!

Bi sernivîsa *Mala me mala we ye, Wan*, xeberek alîkariya ji bo însanên Wanê ku ji aliyê gundiyên Omera ve hatiye organize kirin, agahdarî ji aliyê Hediye Güzel û herwiha di malpera gundê Omera de ji aliyê Sinan Şahin ve hatiye belavkirin.

Bi sernivîsa *Peyam* hekateka ku li rojhilatê Kurdistanê ji aliyê rûspîyekî ve hatiye gotin, bûye mijara vê peyamê.

Medya kurdî û nimûneyeka ji tesîra wê rola medya kurdî bi nimûneyekê hatiye nivîsîn.

Di 15/1-2011an de li Stockholmê ji bo Weqfa Îsmail Beşîkî civîneka agahdarî û piştgiriya çêbûbû. Li ser navê Weqfê birêz Îbrahîm Gürbüz û Ruşen Arslan agahdarî dan. Bi sernivîsa *Sohbetek bi Îbrahîm Gürbüz re* hûn ê agahdariyên berfirehtir li ser avabûna weqfê, armanc û projeyên wê bibînin.

Nesrîn Bayramê bi sernivîsa *Kon û qonax* goçberên kurdên ku hatine li gundên kurdên Anatoliyê konên xwe daynane şîrove dike.

Yılmaz Çamlıbel bi çîroka *Melayê meyxûr* ku li Încovê meletî kiriye, rengêkî din dayê vê hejmarê.

Birêz Xîzan Şîlan, Nuh Atêş, Seyfî Doğan, Mem Xelikan, Muzaffer Özgür, Xamgelî Bane, Ecevit Yıldırım, Îbrahîm Korkmaz, Enver Yurtdaş û birêz Mehmet Bayrak, heryekî bi stîla xwe ya taybetî, nivîsên xwe yên edebî û lêkolînî di vê hejmarê de ji bo we hezkirên kovarê nivîsîne.

Bi hêviya rewşeka aram û azad li welêt sala 2012an li we hemûyan pîroz be!

Alî Çiftçi

Peyam

Şeveka zivistanê ya sar û şevereş, em (Ali û Seyfî) li bajarê Stockholmê, li redeksiyona Bîrnebûnê rûniştibûn û me li ser nivîsan kar dikir. Piştî demekê mêvanekî me ji Kurdistana rojhilat, ji bajarê Kela Makê, ji eşîra Milî, ji malbata Emo Xanê Milî, Ehmed Milan hat seredana me. Em bi hatina Ehmed pir xenî bûn.

Me li ser gelek mijaran sohbet kir. Ehmed bi gotinên xwe yên ji Kurdistana rojhelat sohbeta me zengîn kir. Gotinên ji kal û pîran anî bîra me. Bi van gotinan zanyariyên me zêde kir.

Dema ku me behsa ruhê netewî ya kurd kir, kekê Ehmed bi gotineke dîrokî sohbeta me xweş kir.

Bapîrê min, oda xwe hebû. Hemsalên wî her şev li odê digêştin hev. Wan şevên zivistanê, li ber zova germ a bi agirê kix sohbetên kûr û dirêj, meclisa xwe şên dikirin. Xortan jî heta nivê şevê xizmetê vana bi çay û şîrîniyê dikirin.

Rojekê sohbet li ser kurda bû. Rûspiyekekî, cixara wî li ser lêvê wî, giran giran dest bi gotina xwe kir û bi zarxweşî ev hekata got:

"Rojekê li êlekê kurdan da, bavê du bira çûbû rehmata Xwedê. Ji malê dunyayê, ji lawên xwe re hespekî kêhil û torbekî zêr hiştibû. Lêbelam

herdu bira jî hespê kêhil dixwestin. Cînar û rûspî ketin navbera wana ku wana li hev bînin, ku yek hespê kêhil hilde û yek jî zêran. Lê herduyan jî hespê kêhil dixwestin û ji ber vê jî ev teklîfa qebûl nekirin.

Apê wan jî got: gava ku hûn li hev nayên, baştir e ku em hespê kêhil bifroşin û pera û zêran li hevdu parvekin. Bira ev jî qebûl nekirin.

Cînaran jî nêrîn ku ev li hev nayên, li hev belav bûn û çûn.

Di vê navberê de rêwiyek tîr û têrdirêj li ser milê wî, di rê da dihat û bala xwe dayê ku du kes bi hevdu re şer dikine. Rêwî hat li ba wan sekînî û ji wan pirsî: bo çi hûn şer dikin? Wana jî hal û hekata xwe ji rêwî re gotin.

Rêwî bala xwe dayê ku herdu jî bêaqil in û got: pêşniyareka min heye, eger we got erê, ez ê mûşqulata we hel bikim. Herdu bira jî ev pêşniyara qebûl kirin.

Rêwî got: ez ê bi kevana xwe tîrekî bavêjim, kîjan ji we ev tîra zû paşda anî ba min, hesp heqê wî ye.

Herdu bira bi lez ketin dû tîrê. Ku hîn herdu bira li dû tîrê bûn, rêwî li hespê kêhil sîwar bû, zêr jî kirin heqîvê û ji wir bi dûr ket."

Red.


Mala me mala we ye, Wan

Mala me mala we ye, Wan
Kampanyaya gundiyên omeriyan ji
bo waniyan

Kurdên Anatoliya Navîn xaniyên
xwe pêşkêşê goriyên erdhêjê, wani-
yan dikin û dibêjin "Mala min, mala
te ye" Erdhêja Wanê wijdana gelek
kesan bi xwe re hejand, ne tenê yên li
derdorê bajarê Wanê bixwe, li hemû
herêmên kurdî û herwuha li welatên
derve jî ji bo alîkirina waniyan ketine

tevgerek xurt de û ev yek hê jî dom
dike. Kurdên Anatoliyê ku li Swêd
diminîn xaniyên xwe yên vala li we-
latê xwe pêşkêşê waniyan dikin.

Hediye Guzel li ser kampanyayê
bêtir agahî dide. Kurdên Anatoliya
Navîn hem bajariyên Tavşancali/
Omaroyê, torên civakî di inter-
netê de jî bi kar tînin. Di face-
bookê de bi zimanê tirkî û kurdî
bi navê "Tavşancali evindir Van" ve



Wêne: Sinan Sahin

malperêkê ava kirine.

Heta niha nêzikê 1800 endam tê de hene û ev hemû alikariyên cûrbecûr pêşkêşê waniyan dikin. Hinekan mifteyên xwe dane wan, hinek bi nivînan, hinek cilûberg, lîstokên zarokan û hinek jî pere dişînin.

Ji wan re bûye wek pirseke malbatî, xwedî li xuşk û birayên xwe derketin. Hediye Guze dibêje ku nêzikê 40-50 malbat hene ku gihiştine Konyayê, ji ber ku ziman û dîroka wan yek e, ew xwe di nav ewlehiyê de dibînin.

Hediye Guzel, waniyek ku gihiştîyê maleke germ di klibekê di malpera wan ya fecebookê de behsa rewşa xwe dike: Ya rebb ! dibêje yek ji beşdarên malperê, "tu tîrêjkên rojê ku nava me germ dike bişîne Wanê, serma û zivistana Wanê jî ji me re bişîne. Xûşk û birayên me yên wanî di vê zivistanê de şepirze neke!"

Berpîrsê malperê Sinan Şahin hinek ji çavdêriyên xwe li ser rewşa mêvanên gundê xwe di malperê de dinivîse: "Di gel her tiştê jî zarokan

dev ji leyîstikên xwe bernedan. Li Konyayê zarokan hema ji me leyistok dixwestin. Zarok ber bi pêxwasiya xwe, bêcilûbergiya xwe û bênivîniya xwe nediketin. Di rastî de haya wan li her tiştê heye, dizanin çima êdi di mala xwe ya germ de, li ber pencerê li benda babê xwe namînin. Ev di çavên wan de dixuya ku bi her tiştê haydar in, lê leyîskên wan hêvî ye ji wan re. Em jî leyîskên wan bi wan re par ve bikin da hêviyên wan kêmtir nebin.."

Ev nivîsa han dê ji zarokan re gelek listokan bîne bêguman.

Ne tenê xanî dayîn, civak bi her rengê alîkariya mêvanên xwe dike. Hediye Guzel diyar dike da çima vê carê kurdên Anatoliyê ewqas çalak bûne. Ew dibêje ku berê jî çalak bûn lê dengê wan bilind nedibû. Vê carê me xwest ku em hebûna xwe nîşan bidin ji xuşk û birayên xwe re.

Zayele/Rojevakurd

Medyaya kurdî û nimûneyek ji tesîra wê

Di hejmara 128an a Rûdawê de nûçeyek derdikeve, ji nûçeyekê zêdetir jî trajediya malbateke ji erhejzadeyên Wanê ye. Malbat jin û mêrekî ciwan in û xwediyê keçikeke bi navê Nêrgîz in. Mala wan xirab bûye û bêcîh û bêwar in:

Bi navê Yusuf Polat kurdekî me yî ji Anatoliyê evê nûçeya dramatîk li Swîsreyê dixwîne (di Rûdawê de bi kurdî dixwîne), li malê bi xanima xwe re dikeve şêwrê ku ew çawa bikanin alîkariya vê malbata ciwan û keçika wan bikin. Yusuf Polat telefonî Rûdawê dike, telefona ewê malbata erhejzedeyan ji wan peyda dike, bi mêrê malê Şakir Özgür re dikeve têkiliyê, di dest de pereyekî jî jê re dişîne, dûre edresa mala xwe ya li Xelikan (Anatoliyê) dide wî ku ew bi xanim û keçika xwe ya piçûk re here û li wir, li mala wî bimîne.

Yusuf Polat di hejmara 130î ya Rûdawê de bi nameyekê bahsa prosesê evê yekê dike û dibêje: ez lê dixebitim û dixwazim hinek alîkariyê jî berhev bikim ku ew malbat ji xwe re rojekê dîsa li Wanê xaniyekî ava bike.

Di katastrofên natûrî de, gelek dezgeh hene ku alîkariyê dikin, rojname bûyeran aktuel dikin, di

ekranên televîzyonan de nîşan didin, kampanyayên alîkariyê li dar dixin... ev hemû tişt gelek normal in.

Lê tiştê di evê nûçeya Rûdawê û netîceya wê de herî xweş û balkêş ew e ku nûçe û rojname (Rûdaw) bi zimanê kurdî ye, însiyatîfگیرê alîkariyê, Yusuf Polat ev bi kurdî xwendiyê, ji Rûdawê telefon kiriye, telefona wê malbatê xwestiyê û bi evê rêyê xwe gîhandiyê malbata Şakir û Nazdara wanî.

Cîhê şanazî û kêfxweşiyê ye ku êdî kurd bi zimanê xwe jî dibin xwediyê înfomasyonên medyayî û bi rêya medyaya xwe dikanin xwe bigêhînin daxwazên xwe.

Bîrnebûn



Sohbetek bi İbrahim Gürbüz re

Ali Çiftçi

Birêz İbrahim Gürbüz, em wek kovara Bîrnebûnê xêrhatina we dikin û ev xebata we ya giranbiha ji dil pêroz dikin. Gelo, ev fikira Weqfê ji ku hat û ji bo çi Weqfa İsmail Beşikçi?

– Ez İsmail Beşikçi ji salên 1973an ve nas dikim. Li universîteyê bûm, wê demê kitêbek wî ketibû destê min, ez bawer dikim ku navê kitêbê ”Cumhuriyet Halk Fıkarısı bû”, min xwend. Wê kitêbê tesîrek gelek mezin li ser min û her weha li ser pir kesan kir. Di heman demê de kovarek derdiket, bi navê *Rizgarî*, maqaleyên wî jî tê de çap dibûn û diweşîyan. Min ew nivîsên wî jî dixwendin û jê sud werdigirt.

Paşê min universîte qedand, dûra 12ê îlonê, cunta hat ser hukum û ez ji ketim zîndanê. Dema di hebsê de dimam, ev proje di serê min de weke raman peyda dibûn. Min ji xwe û xwe re got ku: ”Eger ez rojekê ji vê hebsê rizgar bibim û derfet jî peyda bibin, ez ê enstîtu an weqîfêkê tevî ronakbîrên kurdan weke navendeka kurdî vekim û em ê bi hev re li ser çand û dîroka kurdan lêbikolin û bixebitim. Tabî min digot, divê ez berî hertiştî derfetên aboriya xwe baş bikim ku bikaribim di vî warî de xebatekê bimeşînim.

Ez pênc salan di zîndanê de mam. Piştî ku ez ji zîndanê derketim, min şîrketeka petrolê vekir. Aboriya min sererast bû. Êdî wext hat ku min got divê em li ser çand, huner û zanistiyê jî bo kurdan xebatan bikin, weşanan

derxînin. Ev fikira weqfê wê demê di serê min de çêbûbû. Di 1991-1992an de li Stenbolê, NÇM û paşî jî Enstîtu ava bû. Min mamoste İsmail Beşikçi wê demê rûbirû nas kir. Xabatên wî û zanabûna wî tesîrek mezin li ser min kir. İsmail Beşikçi alimekî giranbiha û qedirbilind bû ji bo min. Wê wextê mamoste İsmail Beşikçi 52 salî bû. Rehmetî Musa Anter, Feqî Huseyin û gelek kesayetiyên hêja yên kurdan hebûn ku bi umrê xwe ji İsmail Beşikçi mezintir bûn. Weke mînak Musa Anter 75 salî bû. Lê dema ku mamoste İsmail Beşikçi ji derî ve dihat, ew li ber wî radibû ser piya. Ji mamoste İsmail Beşikçi re digot: ”Tu Sultanê me yî, tu ronîya çavên me yî!” Gelek hurmet jê re dikir û digot: ”İnşallah rojekê Kurdistan ê rizgar bibe, em ê heykelê te li meydana Diyarbekrê bi zêr çêbikin. Yanê tesîr û keda wî ya giranbuha li ser hemû kurdan bêhempa hebû. Bi taybetî li ser rewşenbîrên kurd û hem jî li ser gelê kurd. Tabî wê wextê gelek pirtûkên wî jî hatîbûn weşandin û hebûn.

Piştî 1994an ew jî ji ber wan ramanên xwe yê zanistî û rawerdekirina li ser tahlîla sosyolojîk an diroka kurdan dîsan girtin, avêtin zîndanê. Di heman demê de ez jî firar mam. Di 2002an de dîsan min ew dît. Ev fikira weqfê di serê min de hebû. Tabî di 1991ê de wî tam behsa kitêbên xwe dikir û digot ”Ez dixwazim ku kitêbên xwe bidim kurdan.” Min jî dizanibû ku koleksiyoneke

mezin di destê wî de heye. Mamoste Îsmail Beşikçi digot: “Eger ku rojekê tiştek bibe yan dewlet dê wan tarûmar bike yan jî malbata min dê bi awayekî vê arşîvê bi kiloyan weke kaxez bifroşe, dê ev çawa be?” Baweriya wî bi malbata wî weke bira û birarziyên xwe ve tunebû. Malbata wî jî bo van xebatên wî yê li ser kurdan aciz dibûn. Giraniya xebat û kitêbên wî nedizanîn. Ji bo vê ew jî hertim tedirgîn dibû û digot: “Ez dixwazim van kitêban bidim derve, li Ewropa an jî eger pirtûkxaneyeka netewî ya kurdan ava bibe, ez dê bidim wir.” Tabî ev jî nebû. Di nav van galegalan de mamoste Îsmail Beşikçi dîsan girtin zîndanê û ez jî firar mam!

Paşê, di salên 2005-2007an de dîsan em carcaran dihatin ba hev. Ez carna diçûm Enqerê û carna jî ew dihat Stenbolê. Wî dîsan her xema xwe dîyar dikir û digot: “Em dê çawa bikin, van pirtûkan? Derdê wî her pirtûk bûn. Pirtûk weke zarokên wî bûn. Nêzikî 60 salan ev pirtûk berhev kiribûn. Mîna zarokên xwe lê mêze dikir û ji wan hez dikir. Rojekê dîsa xema xwe bi hestiyar dîyar kir û got: “Rojekê inşallah hûn ê bîn û bibînin, bênerin ku xezîneyeke mezin e bo kurdan. Mixabin rojekê ez dê bimirim, malbata min dê van kitêban bi kiloyan bifroşin!”

Min jî hesreta xwe ya salan, kula dilê xwe ji mamoste Îsmail Beşikçi re got: “Seyda, divê em weqfê ava bikin. Yan di binê sîwana unîversîteyê de, an jî di binê sîwana komeleyê an jî di binê sîwana weqfê de pirtûkxaneyek dikare çêbibe. Mamoste Îsmail Beşikçi jî got: “Ji bo parastina van kitêban û vê

koleksiyonê weqf çêtir e!” Li derûdora wî gelek kesên din jî hebûn ku digotin: “Divê em weqfê ava bikin!” Min jî got: “Em dê weqfê ava bikin û bila navê wê jî *Weqfa Îsmail Beşikçi* be. Ev pêşniyara min bû. Ji bo ciyê Weqfê gelek nav hatin pêşkeşkirin, hinekan digotin: ‘Li Diyarbekirê’, hinekan digotin: ‘Li Doğubeyazîte’ û mamoste bi xwe jî dixwest li Enqerê bê avakirin. Lê rewş li Stenbolê musaîd bû.

Stenbol navendeke çandî ye. Li cîhanê tê naskirin. Hemû cîhan dikare têkiliyê daynê û jê informasyonan werbigrê. Li Stenbolê nêzikî sê mîljon û nîv kurd dijîn. Bo kurdan jî bajarekî muhîm e. Me got, em di destpêkê de li Stenbolê dest pê bikin, paşê em dikarin şaxên wê li ciyên din jî ava bikin. Mesele serê weqfê dikare li Stenbolê be, lê belê govdeyê wê em dikarin li Diyarbekirê ava bikin. Ev fikir wisa derket.

Tabî hinek hevalan xwe bi şun ve girtin û nehatin xebatê, hinek jî hatin! Zaten mamoste digot: “Bila komîteya avakar yanê heyeta mutevellî, yan pênc kes, an jî heft kes bin!”

Ji bo ku kar rihet bimêşe we komîte ji kêman kesan ava kir?

– Belê, me wisa kir. Nêzikî du salan berê me biryar stand. Heyeta Mutevellî yanî endamên rêvebiriyê em pênc kes bûn. Di nav van de sê kes karsaz in. Îsmail Beşikçi, ez, Îshak Tepe, Talat İnanç, Abdullah Baran.

Armanc û navê vê Weqfê, me wisa tespît kir, Mamoste Îsmail Beşikçi jî tiştek negot, yanî ez, kekê İshaq Tepe, evê karbidest, Talat İnanç û Abdullah

Baran. Abdullah
 jî nasê mamoste
 Îsmail Beşikçi ye, ji
 xelkê Qonyayê ye.
 Paşê min ew nas
 kir. Beşikçi digot:
 ew jî dikare bibe,
 wî jî pir dixwest!..

Mamoste Îsmail
 bi xwe pir mutevazî
 ye, fena derwêşa ye.
 Wî bi xwe tiştekan
 nedigot.

Me got: 'Eger
 em weqfê ava
 bikin divê navê
 wê Weqfa Îsmail
 Beşikçi be, ya duduya jî divê armanca
 vê weqfê nasandina navê Îsmail Beşikçi
 be, raman û berhemên wî be. Yanî ar-
 mancên wê wîqas e. Li ser zanyarî, çand
 û civakê lêkolînan bike. Me got, divê
 wisa bibe û mamoste Îsmail Beşikçi jî
 dengê xwe nekir.

*Erê, dema em bala xwe didin berhem û
 xebatên Îsmail Beşikçi, em dibînin pira-
 niya karê wî li ser kurdan e. Ew kesên ku
 niha ev Weqf jî ava kirine, hemû kurd
 in. Gelo em dikarin bêjin ew ê lêkolînên
 xwe li ser doza kurd di qada navnetewî
 de kur bike?*

– Mamoste Îsmail Beşikçi bi xwe
 kurd nine. Mamoste Îsmail Beşikçi bi
 xebat û kiryarên xwe merivekî bi nav
 û deng e, pir mezin e, giranbuha ye.
 Yanî wisa bêjim. Me civînê de jî got, ji
 me pirtir kurd e. Tabî min mecazî got.
 Mesela qetliamek çêdibe li ser kurdan,
 ji me pirtir dilê wî dêşe, ji me pirtir serê



xwe dêşîne. Şev û ro ji bo kurdan ramy-
 ar dibe û dixebite, ji ber kurd mazlum
 in, kurd nebin, xelkekî din bûya jî wî
 dê li ser wan jî serê xwe bêşanda.

Di destpêkê de, di binê siya Weqfê
 de kitêpxane ê çêbibe û helbet piranî,
 % 90-95 ê lêkolîna li ser kurdan be.

*Kekê Îbrahim, di dema damezrandina
 Weqfê de, wek her karê din carna hinek
 pirsgirêk dikarin bibin, ji ber ev karê han
 di gelek aliyên de balkêş e. Gelo hûn bi
 pirsgirekên wiha re rûbirû bûn, an na?*

– Vê xebatê nêzikî salekê ajot. Di
 aliyê fermî da ti pirsgirêk derneket.
 Şansê me baş derbas bû. Konjuktur jî
 hinekî baş bû. Heya nûha çî tengasî
 derneketine.

Aniha ez hê karê ticarî dikim. Abo-
 riya min hema hema çareser bûye.
 Dixwazim vî karê xwe yê ticarî bidim
 kurikên xwe, ew dê bimeşînin. Ez bi
 xwe dê ji vira ha wexta xwe bidim karê
 Weqfê.

Birêz İbrahim, bi rastî we dest avetiye karekî pêroz û ez bi xwe pir pê dişîa bûm. Min di civînê de jî dît. Gelek kesên din jî bal kişandin ser vê meselê. Wek sermîyadarekî kurd, biçûk û mezin ji alîkî, lê wek sembolîk piştgiyîa karekî wiha, ji aliyê tacîreki kurd, ciyê şanaziyê ye. Zatên dewlemend û xanedanên kurdan heta niha xwedî li çand û kesayetiya xwe derketana û biparastana dibe ku ev roj rewşa kurdan ê tişteke din bûya... Dixwazim li vir dubare bikim, ev karê ku we dest avetiye bi rastî pir pêroz e, dema xelkê me pê bizanibe dê dilê wan pir şad bibe û ji vira ha sermayedarên kurd dikarin wî aliyê xebatê jê bibînin.

Di destê me de tu statistik tunene, nimûnên wiha jî tunene. Hebin jî dibe ku ez pê nizamim. Tiştê pir balkêş ev e: we hem malê xwe daye vê xebatê û hem jî hûn ê umrê xwe yê mayî bidin vê xebata pêroz. Xwedê umrê we dîrûdirêj bike...

– Tabî, pere muhîm e, aborî muhîm e. Aborî baş nebe meriv nikare pir tiştê bike. Ev pir muhîm e. Lê belê di nav kurdan de ruhê netewî kêm e! Mamoste Îsmail Beşikçi di her pirtûka xwe de li ser vê nîqaş dike. Dibêje: 'Di nav karsazên kurdan de ruhê netewî kêm e.' Eger ruhê netewî di me de mezin bibûya, nûha di Stenbolê de divê serayeke kurdan ya çandî hebûya. Du sê televîzyon û sê çar radyo hebûna. Yanê her tişt pere jî nîne. Temam, pere heta ciyekî muhîm e. Niha ez dibêjm, em numuneyekê ava bikin dibe ku bala hinek sermayedar û karsazên kurdan jî bikêşîne.

Niha numûnê yahudiyan heye. Ê wan sê kaseyên (çekmece) wan hene,

yek a sermaye wan e, yek ji bo karê nû ava bikin û yek jî ji bo welatê xwe. Yanî sê cuzdanên wan hene.

Banga min ji karsazên kurdan ev e: bila dewlemend bibin, bila karê mezin bikin. Eger em aboriya xwe xurt bikin dengê me ê li dunyayê pirtir derkeve. Lê divê hinek ji alîkarî bidin zimanê xwe, çanda xwe û hunera xwe. Piştgiri bidin lêkolînên zanyarî, çandî û zimanî. Yanî ev dikare ji sedî yek be jî, divê hinek pereyên xwe ji netewe ango gelê xwe re veqetînin. Yanî çava bêjim, ez niha dibêjim, du kurê min hene. Yê duyem Weqfa Îsmail Beşikçi ye. Yanî bi vê armancê bila piştgiyî bidin xwe! Bidin zimanê xwe, hunera xwe û bidin çanda xwe!

Ez li Stenbolê gelek kesan nas dikim ji bo taştê diçin Saraya 2000 euro xerç dikin, lê ji bo çanda xwe û ji bo karekî wiha dîr disekinin. Ev tiştê nebaş e! Yanî banga min ev e, divê em xwedî li vê Weqfê derkevin piştgiyîa armanca wê bikin. Yê mamoste Îsmail Beşikçi bi xwe du malên wî hene, yek li Enqerê û yek jî li Îskilîbê, ev her du jî dane Weqfê.

Ne tenê ev, jiyana xwe daye vê dozê.

– Belê, hemû jiyana xwe daye doza kurdan, daye zanyariyê, daye însanetiye. Hîjdeh salan zêdetir di zîndanê de maye. Hemû pirtûkên xwe di 60 salan de berhev kiriye û dayê Weqfê, daye Kurdan! 38 kitêbên wî hene û hemû mafê telîfê daye Weqfê. Divê miletê kurd jî xwedî lê derkeve, xwedî li xwe derkeve!

Însanên me dema tişteki dikin dibên: me va kara ji bo vî tîştî kir. Lê normal, ez difikirim yanî meriv kareki dike bo xwe dike. Niha we bîr û bawerîya xwe bi vî karî aniye, dilê we pêre ye û we dest avêtiye vî karî. Bo vê jî li ba min tişteki pir pîroz e.

– Erê, ez bo xwe dikim. Bo zimanê xwe, bo însanetiya xwe, bo neteweya xwe. Ev wezîfeya me ye.

Di daxûyaniya damezrandina Weqfê de we armancên xebata xwe wiha aniye ziman: “Em weke Weqfa Îsmail Beşikçi dixwazin ku navê Îsmail Beşikçi, raman û berhemên wî jîndar bikin. Di asta xebata zanyarî, civakî û çandini de lêkolînan pêk binin. Bicîhkirina bibliotek, arşîv, dokumantasyon û saziyên perwerdeyîyê, navenda çandiniyan, vekirina enstîtu û muzeyan, armancên me ne. Li gel van xebat û armancan, em weke Weqfa Îsmail Beşikçi dixwazin ku di beşên cuda cuda de pêşbaziyan li dar bixinin û xelatên Îsmail Beşikçi bidin”

Tabî ev armancên cuda cuda û pir berfireh in. Helbet ji bo ku ev xebat bi cih bibin Weqf bi serê xwe tenê nikare ji bin barekî wiha derkeve. Ji bo ku ev armancên Weqfê bi cih bibin, piştgiriyên madî û manewî yên netewî û navnetewî pêwîst in? Gelo hûn ê bi çi awayî vê xebatê bimeşînin?

– Ji bo mamoste Îsmail Beşikçi prensib e û dibêje: em alikariyê ji welatên derve nagra. Em tenê dikarin alikariyê ji dewleta Federal a Kurdistanê başûr werbigrin. Saziyên sivil yên Turkiyê û Kurdistanê, eger bidin me, em qebûl dikin. Yê şexsî, karsaz,

kî dibe bila bibe, li dinyayê karsaz û şexsiyetekî îngilîzî jî bibe, em qebûl dikin. Yanî karsazekî amerîkî jî bi serê xwe, li ser navê xwe alikariyê bike, em ê vê jî qebûl bikin. Lê belê, mamoste Îsmail Beşikçi dibêje: “Welatên Ewropayê Kurdistanê parçe parçe kirine, em ji wan welatan alikariyê qebûl nakin. Em dixwazin piştgir û dilxwazên Weqfê li her parçeyên Kurdistanê û li derveyî welêt jî kom bikin û bi wan re têkevin tekiliyê. Em dê organizasyoneka çawa ava bikin? Em dê çend komîsyonan ava bikin. Wek komîsyona şewirmend, komîsyona zanyariyê, komîsyona weşan û komîsyonek jî ya dîrûdirêj a dilxwazên Weqfê. Herkes dikare tê de cih bigrê. Karsaz jî dikarin. Ji bo wê bi hemû dinyayê re têkiliyên me dê hebin.

Li Swêdê gelek sazî, weqf û fondên taybetî yên serbixwe hene û piraniya wan jî ji bo pêşketin, mafê mirovan û mafê fikra azad ji bo organizasyon û xebatên li welatê din alikariyê dikin. Gelo ji wan saziyan hinêk bixwazin piştgiriyê bidin Weqfê, hûn ê werbigrên?

– Mamoste Îsmail Beşikçi, van du salên dawî welatên Ewropa pir rexne dike, sazgehên wan yên sivil jî rexne dike. Yanê sazgehên huquqî, unîversîte û çapemeniya wan jî gelek rexne dike. Yanî naxwaze!

Tabî bi vê ve girêdayî, min xwe jî carekê pê ra deng kiribû, bê ka ev ê bikaribe bo sêminar an konferansan bêt derveyî welêt û qebûl nedikir, helbet ev dîtînen wî ne, divê heta dawiyê jî meriv jê ra hur-

met bike. Lê em tiştêkî din jî dizanin, herçiqas ew rexnên xwe jî li wan bike, dema Beşikçi bi xwe bi wan re rûbirû bibe, dê tesîra wî hê zêde be. Heta ku bi xwe hê li jiyânê ye. Mesela sibê unîversîteya Stockholmê, li ser vê mesela kurd wî dawetî konferansekê bike, bê ka bila bê dîtîne xwe pêşkeş bike, gelo dê ne di cîh de be ku Îsmail Beşikçi bi xwe bê? Erê li Turkiyê dîtîne û ramanên wî tîne nasîn, gelo dema ev li masmediya Ewropayê de bê nasîn ê hîn bi tesîr nebe?

– Pir kesan, wek min û te jê ra gotine: Seyda tu çima dernakevî derveyî Turkiyê, nayê Kurdistanê. Mesela tu çima naçî Stockhomê yan jî Fransayê, konferansekê nadi? Yanî biryar a wî ye!

Dibêje: "Di Kurdistanê de, Kurdistaneka azad çêbibe yan jî îtifaqa kurdan pêk bê, konferansek navnetewî pêk bê, ez dê biçim. Mesela, Mam Celal Talabani, Kak Mesut Barzani û mamoste Berhem Salih ew dawetî Kurdistanê kirin. Lê qebûl nekir. Got, eger îtifaqa kurdan bi tevayî çêbibe ez dê bêm yan jî dewleteka azad ku statuya wê li dunyayê hebe, bêt avakirin, ez dê bêm. Bes ez niha nayêm. Niha ev biryara wî ye, sibê vê biryara xwe biguhare an na, ez nizanim!

Di avakirina Weqfê de qasî ku em pê dizanin tu kesên tirk tune ne? Gelo tu sermayedarek, rewşenbîrek an jî kesayetiyeke tirk di vê dema avakirina Weqfê de, serlêdanek li we kir, an jî we ti jî wan dawxwezeka wiha kir an na? Çima navekî tirk di nav vê Weqfê de tune ye?

– Na, tu serlêdanek wiha nebû. Lêbelê, di nav tirkên de hêdî hêdî mamos-

te Îsmail Beşikçi keş kirine. Li Anqerê, İzmir û li Stenbolê grup hene li ser navê Beşikçi îmzan kom dikin. Li Anqerê rewşenbîrên tirkên sempozyomê çekirin. Her weha li Stenbolê jî hat çekirin. Ev du sal in xebatên wiha dibin. Yanî generasyoneke nû derdikeve di nav tirkên de. Wek îdol dest pê kirine. Di nav unîversîteyan de jî berfireh dibe.

Meriv dikare bêje, di nav generasyona nû de, ev kesên ku lêkolînan dikin, dîtîne û ramanên Îsmail Beşikçi wek çavkanî bi kar tînin. Sala çûyî di nav weşanên Îletîşimê de bi navê Îsmail Beşikçi ji aliyê Bariş Ünlü û Ozan Değer ve kitêbek hat weşandin. Cenabê we jî dîtînen xwe li ser Beşikçi, di vê kitêbê de nivîsandibû. Bi ya me ev xebateka baş bû. Heta me di kovara Bîrnebûnê de ev kitêp da nasandî. Bi ya min, dîtîne û ramanên Beşikçi di nav kurdan de baş tîne zanîn, ya muhîm ev zanyarî, dîtîne û ramanên Îsmail Beşikçi di nav tirkên de û li derva jî bîne belav kirin û nasandî. Ez di vê baweriyê de me.

– Her sal dê zêdetir bibe. Xwedî derketina li mamoste Îsmail Beşikçi di nav tirkên de roj bi roj zêde dibe. Dê gav bi gav bilindtir bibe. Wî keş dikin. Hurmeta wan berz dibe.

Bîrêz Îbrahîm, di dawiyê de dixwazim pîrsekê bo şexsê te bikim. Tu zanî kovara Bîrnebûnê, kovareka hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên Anatoliyê ye. Di kovarê de li ser eşîr û malbatên di nav kurdên Anatoliyê de hinek lêkolîn hatine belav kirin û di vî warî de em lêkolînan belav dikin. Bi vê re girêdayî, gelo

Îbrahim Gürbüz kî ye, ji ku ye û ji kîjan eşîrê ye?

– Ez we pîroz dikim di destpêkê de. Tîşteki pîroz e, bi qîmet e. Ez kurdên Anatoliyê nas dikim. Abdullah jî niha nas dikim. Welatparêz in. Li ziman û çanda xwe xwedî derdikevin. Ev pir muhîm e! Nav kurdan de xwedîderketina li çand û hunerê kême. Yanî kême qîmetê didinê. Lêbelê li ba kurdên Anatoliyayê li ser vê xebatê gelek hesasiyeta wan heye. Ez li vira karê we jî pîroz dikim. Bi hatina vira ez gelek kêfxweş bûm.

Ez 1955an de li Qers/Sariqamîşê hatime dunê. Pêncsalî bûm, yanî di 1960an de malbata me koçber bû, em çûn Îzmirê. Ji bo aboriyê. Nasekî malbata me hebû, em çûn wir. Min dibistana destpêkê, lîse û heta universîte li wan deran xwend. Min beşa muhendîsiyê ya kîmyayê li Eskişehirê qedand. Nêzikî salekî, li Sivasê di dibistanan de min mamostetiya kîmyayê kir. Paşê li Stenbolê di muzexaneyê arkelojîyê de wek muhendîsê kîmyayê, sal û nîvekê kar kir. Paşê derbederiya 12 îlonê hat, ez girtim zîndanê. Nêzikî pênc salan ez di zîndanê de mam. Me pir zor û zordarî dît. Nêzikî 200 rojan greva birçibunê di ser min de derbas bû. Ez di zîdana Mamakê û paşê jî di ya Bayrampaşayê de mam. Piştî ku ez ji zîndanê derketim, min dest bi karê petrolê kir. Wek karsaz heta niha jî vî karê petrolê dikim. Di 1991an de Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) me ava kir. Ev fikrê min bû. Weke min berê jî bo we ragihand, hê ez di hebsê de bûn, min got: eger ez derkevim, di

destpêkê de ez dixwazim navendeka çandî, înstîtuyeye kurdî, weqfek kurdî, radyoyek bi pir zîmanî min dixwest vekim. Vana hemû pêk hatin. Min hem karsazî kir û hem jî ev karên çandî û zanîsiyê berdewam kir. NÇM sazgeheka netewî bû. Paşê me Înstîtuya Kurdî û piştra jî radyoyek bi navê ”*Yaşam*” bi 11 zîmanên ku li Anatoliyê tên dengkirin ava kir. Ev radyo niha jî li ser internetê her berdewam e. Niha jî Weqfa İsmail Beşikçi heye û ji vira şun da jî ez ê xwe bidim vê weqfê.

Xwedê qewet û bereketê bide karê we. We karên pîroz kirine. Lê te negot, hûn ji kîjan eşîretê ne?

– Ez ji eşîreta Kaska me. Kaska bi eslê xwe girêdayîyê milîya ne. Kalê me wisa digot, milîya berê hatine Konya–Cihanbeyliyê, paşê çûne Qerekosê–Sariqamîşê. Êşîreta Milî konfederesyonek e. Serokê wê jî di qirna 19mîn û serê qirna 20mîn de Îbrahim Paşayê Milî bû. Kaska jî girêdayê Milîya ne. Bavê min wana digotin, hinek ji eşîra me li Cihanbeyliyê mane. Dibe ku em merivê hev bin jî!

Mala we ava be, we zahmet kir, hûn heta vira hatin! Ez bi naskirina we û her wiha bo vî karê we yê pîroz jî gelek dilşa bûm. Bi vê sohbetê re herwiha em ê Weqfê jî bidin nas kirin. Ji destê me jî çî bê, em ê bikin û bibin piştgirê wê xebetê. Her serkeftî bin!

– Mala we jî ava! Xebat xweş! Her bijîn!

WEQFA ÎSMAİL BEŞİKÇİ HAT DAMEZRANDIN

Nêzikî yek salekiye ku ji alîyê grubekî rewşenbîr û karbidest ve, ev xebata damezrandina Weqfa Îsmail Beşikçi destpêkirî bû. Karê damezrandina Weqfa Îsmail Beşikçi di tarîxa 29.11.2011î de ji alîyê Muduriyeta Giştî Ya Wekfan (Vakıflar Genel Müdürlüğü) hate pejirandin û di rojnameya fermî (Resmî Gazete) de çap bû.

Navê Îsmail Beşikçi di wîcdana mirovetîyê de, di rûpakîya zanyarîyê de serbilindîya rewşenbîrîyê ye. Helwesta wî ya dilêr û di cîh de ku ji bo hemû hêzên demokrasîyê di dilê gelan de bi cîh bû ye, me xwest ku em vî navî anku navê Îsmail Beşikçi bi weqfê bigîhînin nivşên paşerojê.

Di vê dema ku em tê de dijîn mirovayeti, zanyarî, çandinî û etîk gelekî dejenere bû ye. Peyva weke hûqûk, adalet, demokrasî, mafê mirovan û hwd. Ji alîyê ideolojîya fermî ya îdarî ve tê darizandin û zextkirinî. Îro di cîhanê de giringîyê etîk û bawerîyê ji alîyê dewletan ve gor berjewendîyên xwe bikartînin û mirovayeti daxistine buhaya diravî û bê paye kirin e. Di heman demê de mirovetîyê ji nava xwe mirovekî weke Îsmail Beşikçi yê zanyar jî derxistî ye. Me xwest ku em wan ramanên, ked û xebatên Îsmail Beşikçi ji nivşên duwaroj re parve bikin. Ji vê bonê me xwe ji vê vazîfeya pîroz re rûbirû kirîye û ev kar daye ser milê xwe. Em weke Weqfa Îsmail Beşikçi dixwazin ku; navê Îsmail Beşikçi, raman û behremên wî jîndar bikin. Di asta xebata zanyarî, civakî û çandinî de lêkolînan pêk bînin. Bi cîhkirina bîbliotek, arşîv, dokumantasyon û sazîyên perwerdeyîyê, navenda çandinîyan, vekirina enstîtû û muzeyan armanca me ye. Li gel van xebat û armancan; em weke Weqfa Îsmail Beşikçi dixwazin ku di cûda cûda beşan de pêşbazîyan bi kar bixînin û xelatên Îsmail Beşikçi bidin. Dîsa em dixwazin ku di alîyê medya, çapamenî û weşangerîyê de ji xebatan pêk bînin û encaman bistînin.

Di heman dema damezrandina vê weqfa me de, li gel wê me karê bîbliotek ango Kutupxaneyê Lêkolînê ya Îsmail Beşikçi jî damezrandîye. Îsmail Beşikçi, 60 sale ku bi kedeke granbûha û xwedi naverokekî dewlemendîtir ji kitêb ango pirtûk, kovar, koleksiyona rojnameyan û arşivan pêk hatîye, di demekî nêzik de ji bo xizmeta wan kesên hûnermend, lokolînan û xwendekar re dê amade bibe.

Weqfa me ji xwe re armanc kirîye ku di beşa zanyarî, civakî û çandinî de lêkolînan pêk bîne. Di vê hewildan û xebatê de navê Îsmail Beşikçi ji bo me û hemû lêkolînêr û zanyaran re navekî giring e û ji her aliyê ve remz e. Ji vê bonê em dizanin ku navê Îsmail Beşikçi ji bo wan kesên bawermend û dilxwazên ku ji geşbûna zanyarî û hûnerê re ne kelecaneke bi hempa radigre.

Weqfa Îsmail Beşikçi ji civakê re di asta zanyarî, civakî û çandinî de dê asoyeke nû veke û tecrubeyan destbixîne. Em, bangawazîya hemû kesên ku ji zanyarî û hûnerê re têkildarin dikin ku; bila bibin DÎLXWAZÊ WEQFA ÎSMAİL BEŞİKÇİ û bibin piştgirê vê weqfa me.

RÊVEBIRÎYA WEQFA ÎSMAİL BEŞİKÇİ
Heyeta Mûtevellî, endamên Rêvebirîyê
Îsmail Beşikçi - Serok
İbrahim Gürbüz - Cihgirê Serok
İshak Tepe - Hesêbgêr
Talat İnanç - Endam
Ruşen Arslan - Endam
Abdullah Baran - Endam
Ahmet Önal - Endam

Mobil: 05356424236
ismailbesikciblibrary@gmail.com

İsmail Beşikçi Vakfı
US DOLARI BANKA HESABI
Garanti Bankası Galtasaray Şubesi
IBAN: TR82 0006 2000 0680 0009 0798 51
Hesap No: 68/9079851

TL BANKA HESABI
Garanti Bankası Galtasaray Şubesi
IBAN: TR08 0006 2000 0680 0006 2966 04
Hesap No: 68/6296604

EURO BANKA HESABI
Garanti Bankası Galtasaray Şubesi
IBAN: TR12 0006 2000 0680 0009 0798 50
Hesap No: 68/9079850

Kon û qonax

Nesrin Bayram

Hînek dem, hînek wêne hene ku ji bîriya meriya naçin. Îsal li dardorên gundên me mêla(bala) min çû ser çand tiştan. Min jî xwest ku ez wan çavdêriyên xwe vê carê bînim ziman. Meha tîrmehê ez û malbata min ji bo dîlaneke li gundê Kutuga(Kütükuşağı-Cihanbeyli-Konya) hatibûm dawet- kirin. Ez û çend heval û hevrêyan bi erebeyên xwe em sibe amade bûn. Wek ku bûye adet em hemû kes ketin rêzê û me da dû hev. Gava ku ez, da- yika xwe û xwûşka min li ber çarşiya Eşpiyeyê li benda birayên xwe û çend kesên din dawestîbûn, Reşo, Muzaffer, Ali û Gültekin bi malbata xwe ve tev li me bûn. Di wê gavê de yekî ji wan got: "We bihîst! We bihîst!... qezayek li pêş me bûye. Bila giran bajon! Bi ber hevdu mekevin!"

Lê ez bi xwe li Danimarkayê çend caran bûm şahîd ku ew kesên şîretan dikin, bi xwe ji bo ku bi ber bikevin bi qusûr dajotin. Min dilê xwe de got: „Wek hercar em ê dîsa li vege- rê têkevin peşbirkê“ Siftê Muzaffer, dû wî de jî ez, Reşo, Ali û Gültekin... rêza erebeyên me wisa çêbû û em bi rê ketin. Konvoya me gelek bi tedbîr bi 80km sûrat berdewam kir. Qeza ji hemû kesian re bi rastî jî bû şîret. Li ser rîya Încovê(Cihanbeyli-Konya) zevî, traktor û mirov wek wêneyekî xweş ketin ber çavên min. Di dilê min de derbas bû û min got: „Xweskek ez niha şuna dawetê biçiyama cem wan mirovan û min sohbet bikira“.

Bi wan xeyalan em ji Încovê derbas bûn, li kêleka rê bi ser fabrikayek ve min kon ditîn. Bala min gelek çû ser



wan konan. Min ji dayîka xwe pirs kir: „Ew kî ne dayê?“ Dayîka min got: „Ew xerîb in, kurd in, ji bo kar hatine vir “. Ha, min got, gere ez bi wan re deng bikim. Dayîka min got: „Wextê ku em vegeriyan, em ê biçin cem wan“. Em bi tûtikên ereban hatin ber mala bûkê. Lê belê dawet hîna dest pê nekirîbû. Li Kûtika muzîkvan gelek kêr bûn û di meha tîrmehê de ji dawet pir in. Diviyabû ku em li benda muzikvanan rawestiyana, heta wan li daweta din bûk derxista. Ev bû sedemek baş ji min re. Ez û dayîka xwe em li erebê siwar bûn û me berê xwe da konan. Dema ku niha ew mirov tîna bîra min, tîlîyên min dicirifin. Wan konan, hatina me kurdên Anatoliyê anî ber çavê min.

Havînan gelek kes di wê reyê re bi mercedesan derbas dibin. Li alîyekî rê, di binên malên Încovê de li kêleka rê ew konên xizanî û xerîbîyê, li aliye dinî rê jî pozbilindî û qonaxên dewlemendan! Ez bawer dikim yê ku serlêdana wan konên xerîban dikin û xatirên wan dipirsin pir pir kêr in. Lê gava ku dapîr û bapîrên me hatine wira yunanên alîkariya wan kiriye! Eee bila em jî xwe bi misilmantiyê bipesînin! Em naxwazin tazîbûn û bîrçîbûna wan bibînin. Ew mirov ji ber şer û xizaniyê perîşan in. Ji Mêrdînê, ji Urfayê..., kurd, ereb,

asurî yan jî tirk... kî dibe bila bibe, wek mirovan jîyan mafê herkesê ye. Em kesên ji Ewropa tîna, em tenê li taştê û nîvro bi sed qaymî xwarinê dixwin. Ew mirov li ser terlayê, sibe heta êvarê bi bîst qayma kar dikin! Rewşa konan jî dilê min î ku zîz bûye destûrê nade ez li vir binivîsim. Daxwaziya min ew e ku herkes bi xwe biçe halê wan bibîne û eger mumkûn be alîkariyê bi wan re bike. Sewap ne ew e ku ji bo xêra dê û bavên xwe piştî xwendina mewlûdê sêsed qaymî têxe beriya îmaman. Xêr ne alîkariya ji bo saziyên wek „deniz feneri“yê ye! Kes nîzane ew xêr diçin kuderê lê xêrxwaz xwe pê dipesinin!

Ew xizan, şeş mehan di wan konan de per û perîşan dijin ji bo ku rizqên zarokên xwe bi hevgîne. Belkî hinek bêjin pera qezençê dikin, lê ew pereyên kebaban qezençê nakin, tenê qezença wan terî bulgurê wan dike. Hinek ji wan li ser rîya gurbetê, hinek jî li ser rîya mala xwe dimirin. Dibe ku hinek ji qezença xwe jî nikarin bixwin. Derdê me jî bes qonax li kêleka qonaxan çêkirin e û wekî din jî em di qîreta dawetên musrifê de ne, lê mixabin dibe ku ew zewacê sêh mehan jî najo. Gotina min ew e ku em careke din li ser vî wêneyê **kon û qonaxan** bifikirin.

Danimark

Melayê meyxwur

Yilmaz Çamlıbel

Încov, nehiyeke Qonyayê ye. Ehlê nehiyê, serdanpê kurd in. Ehlê wê derê qedera 200 sal berê, ji gelek sedeman Kurdistan terk kirine û hatine li Încovê cî û war bûne. Ehlê Încovê hemû jî dewlemend in. Xwedan zevî, mêrg, pez û dewar in.

Piştî ewqas salan, dîsa jî ziman û kultura xwe parastine. Zarokên wan, zimanê tirkî di dibistana ewil da hîn dibin. Gor torevaniya kurdan, serokê malbata herê dewlemend, ji wan ra axatî dikir. Navê vî camêrî Çawîş Qert bû. Pirs û pirsgirêkên civakî, aborî û siyasî, di serokatîya Çawîş Axa da dihate çareserkirinê. Piraniya ehlê nehiyê, li ser şopa Seîdê Kurdî dimeşîyan, bi gotineke din, Nûrcî bûn. Digotin, “Ew kurd e, ji miletê me ye. Ew rêberê me ye, şêxê me ye.”

Melê Încovê, mehek berê çûbû rehma Xwedê. Kes tunebû ku ji wan ra îmamî bikira. Bi gotinek din, ev mehek bû terkî selad bê nimêj bûn. Merivên oldar, ji wê rewşê gelek aciz bûn. Rojekê sofîyên nehiyê li hev kom bûn, çûne mala Çawîş Axa, jê ra gotin:

– Axa! Ev mehek e em ji Xwedê ra secde nakin. Ezanî Mihemedî nayê

guhên me. Em hemû terkî selad bûn. Tobe, tobe! Nehîya me bûye kafiristan. Tu çima ji me ra melekî alim nabînî?

Li ser van gotinên sofîyan, Çawîş Axa li trombêla xwe sîyar bû, çû Qonyayê. Rast çû karxana nasekî xwe, jê ra got:

– Hecî Cebbar! Melê me mehek berê çû rehmetê. Em bê îmam man. Ez dizanim têkilîyên te bi terîqatan ra heye. Ez bawer im nuha tu gelek aliman nas dikî. Gelo tu nikarî ji me ra melekî xwendî û zana û alim bibînî?

– Daxwaza te li ser serê min, ser çavên min. Tu çend roj îzin bide birayê xwe, ez ê ji te ra alimekî mezin bibînim, tu qet meraq neke.

– Baş e. Sê roj paşê mehkema min heye. Heta sê rojan îmamê me hazir bike.

Çawîş Axa mizginî da sofîyan ku sê roj paşê ji wan ra alimekî bi nav û deng bîne. Şahiyeke mezin kete nav oldarên kurdan.

Sê roj paşê Çawîş Axa çû Qonyê. Piştê mehkemê rast çû karxana Hecî Cebbar. Mirovekî qemer, rûken li cem wî rûniştibû. Hecî Cebbar ew nîşanê Çawîş Axa kir û jê ra got:

– Bira can, ev mirovê muhterem, xelqê Mêrdînê ye. Eslê xwe ereb e. Di gelek medresan da perwerde bûye. Alimek naskirî ye. Ji vî camêrî ra dibêjin Seyda Evdîlfehah. Ew zimanê erebî, farisî, tirkî û kurdî dizane.

Çawîş Axa bi dilxweşî û dilşahî li nav çavên wî nihêrî û jê ra bi kurdi got:

– Seydayê delal, tu li ser seran, li ser çavan hatî. Ger cenabê te were ji me ra îmamtiyê bike, em ê gelek kêfxweş bin.

Seyda Evdîlfehah jê ra got:

– Çawîş Axa! Hecî Cebbar li ser cenabê te û li ser kurdên me yên Anatolîyê gelek agahdarî dan min. Ez gelek bextewar bûm. Ez teklîfa cenabê te bi dil û can qebûl dikim.

Çawîş Axa got:

– Gelo ez kingê werim te bibim?

Şuna Seyda Evdîlfehah, Hecî Cebbar bersîv da got:

– Heyran! Tu ê çima carek dinê werî? Hema nuha Seyda hilde û bi xwe ra bibe.

Çawîş Axa zivirî ji Seyda pirsî:

– Seydayê delal, tu ji gotina Hecî Cebbar ra çi dibêji?

– Çima nebe? Em dikarin îro bi hev ra herin. Lê divê ez ji otêlê kel û melên xwe hildim.

Hecî Cebbar got:

– Seyda, tu rabe bi şoforê Çawîş

Axa ra here otêlê. Kel û melên xwe hilde û were vira. Paşê bi hev ra bi rê kevin û herin.

Gava Seyda ji cem wan derket û çû. Hecî Cebbar zivirî, ji Çawîş Axa ra got:

– Bira can! Çawa min ji te ra got, ev alimekî gelek navdar e, alimekî mezin e. Divê tu malek rind û meaşek bilind bîdî wî.

Çawîş Axa got:

– Hecî Cebbar, tu qet meraq neke. Çi ji destên min tê, ez ê bikim.

Seyda Evdîlfehah û Çawîş Axa, saetek paşê ber bi Încovê bi rê ketin. Milet bi kelecaneke mezin hêviya axê sekinî bû. Çawa toz û dûmana trombêlê ji dûr va hat dîtîn, galegaleket nav milet. Herkes derket ser rê û benda trombêlê sekinîn.

Trombêla axê hat li ber wan sekinî. Berê Çawîş Axa ji trombêlê peya bû. Paşê mirovek qemer, rûken, 30–35 salî peya bû. Li cimaetê nihêrî û bi dengê dawudî ji wan ra got:

– Eselamin eleykum. Rehmetullahu berekatuhu...

Herkesê selama wî wergirt. Çûn destê îmam maç kirin. Hal û xatirên hev pirsîn. Bi hev ra çûn di qonaxa axê da runiştin. Çawîş Axa, Seyda Evdîlfehah nîşanê gundîyan kir û ji wan ra got:

– Gundîno! Min ji we ra alimekî

bi nav û deng anîye. Seydayê me, xelqê Mêrdînê ye. Eslê xwe ereb e. Wek bilbil Quranê dixwîne. Him erebî, him jî kurdî dizane.

Ser vê gotinê galegalek ket nav cimaetê. Milet dev ji tirkîyê berda û dest pê kirin bi hev ra bi kurdî peyivîn. Hinek kalemêr çûn seyda ramûsan. Şîva xwe li mala Çawîş Axê xwarin. Paşê bi hev ra rabûn çûn mizgeftê nimêj kirin.

Birazîyekî Çawîş Axa hebû. Terkî selad bê nimêj bû. Ne rojî digirt, ne jî nimêj dikir. Ew têrê nedikir, di ser da jî meyxwur bû. Jê ra digotin Samîyê Sor, Samîyê komunîst.

Samî di kuçe û kolanan da, car caran rastê îmamê nû dihat. Îmam, daim bi dilgermî li Samî dinhêrî. Bi dengê dilovanî silav dida Samî. Ev rewş, bala Samî dikşand. Helwesta îmam di mêjîyê xwe da dinirxand, lê ne digihîste tu encamî.

Samî di serê xwe da digot:

– Ez yeqîn bawer im ku gelek kes nuha ji îmam ra gotine, “Eman Seyda! Bi Samîyê Sor ra têkilîyê daneyne. Ew mirovekî şerabxwur e, Xwedê nas nake, bê dîn û bê îman e. Komunîst e.” Li ser van gotinan çawa dibe ku îmam her daîm silavê dide min, bi dilgermî hal û xatirê min dipirse?

Sofiyan Încovê ketibûn rêzê. Her roj yekî Seyda Evdîlfetah gazî xwari-

na êvarê dikir. Samî, di mêjîyê xwe da got, “Ê baş ew e ku ez jî rojekê îmam dawetê mala xwe bikim. Hela ez tesele bikim ka rewş û nîyeta melayê me çi ye, çi nîne.”

Rojek li ser rîya mizgeftê rastê hev hatin. Silav dane hev. Samî bi dengê nizm ji îmam ra got:

– Seydayê ezîz, tu her şev dibî mêvanê malekê. Rojekê jî bibî mêvanê min, nabe?

– Heyran te kingê gazî min kir ku ez nehatime mala te?

– Wele heqê te heye. Tu sibe êvarê mêvanê min î.

– Sibê nabe, lê dusibe dibe.

– Baş e, ez dusibe li benda cenabê te me.

– Ser seran, ser çavan.

Du roj paşê Seyda Evdîlfetah çû mala Samîyê Sor, bû mêvanê wî. Berê şîvê qasekî bi hev ra sohbet kirin. Paşê li dor sifrê li pêşberê hev rûniştin. Samî li nav çavên Evdîlfetah nihêrî û bi dengê nizm jê ra got:

– Seydayê ezîz! Qusûra min mêze neke. Ez her şev bi xwarinê ra çend qedeh mey vedixwim. Ger venexwim, hetanê berbanga sibê xew na-keve çavên min. Mey ji bo min wek derman e. Divê tu min biborînî û destûrî bidî min.

Seyda Evdîlfetah, li nav çavên Samîyê Sor nihêrî û got:

– Xêr û gunê li ustîyê te ye, birê min. Çawa dixwazî usa bike. Ji bo min problem nîn e.

Samî çû devê sanduqa taybetî vekir. Şûşek şerab û du pîyale anî danî ser sifrê. Her du pîyal bi şeraba sor tijî kir. Yekî ji xwe ra hilda, yê dinê danî ber seyda. Samî di bin çavan da, li seyda temaşe dikir. Dit ku seyda ne bi hêrs e û ne jî aciz e. Kêfa Samî hat. Hema pîyala xwe bilind kir û got:

– Seydayê ezîz! Tu li ser seran, ser çavan ra hatî mala min. Hatina cenabê te, ji bo min û malbata min şerefek mezin e. Ez qedeha xwe ji bo dost û hevaltiya me bilind dikim.

Ser gotina Samî, Seyda jî pîyala xwe rakir û got:

– Ez jî pîyala xwe ji bo biratiya me bilind dikim.

Ew şev, îmam û Samî bi hev ra li ser gelek tiştan dûr û dirêj sohbet kirin. Di wê demê da du şûşe jî şerabê xilas kirin.

Çend roj paşê Samî carek dinê gazî Seyda kir. Vêca şûşek araq vexwarin. Di orta sohbetê da Samî ji seyda pirsî:

– Ez benî, tu meyxwurekî gor dilê min î. Hela bêje min, ka ev meletîya te ji kuderê tê?

Evdilfetah ji qedeha xwe firtek araq vexwar, zivirî ji Samî ra got:

– Samî beg! Min li Mêrdînê

dikandarî dikir. Hal û wextê min gelek xweş bû. Li pîyasa Entabê, Enqerê, Îzmîrê û Îstenbolê her kes min nas dikir. Di wan metropolan da çiqas bar, pavyon, qumarxane û meyxane hebûn, ez digerîyam. Di wê rêyê da min gelek pere xerc kirin. Hebûna min wek berfa buharê helîya. Min îflas kir. Haciz danîne ser mal û milkên min. Ez di pîyasê da, rezîl û ruswa bûm. Mecbûr mam, ji welat revîyam. Li gelek cîyan geriyam, lê min ji xwe ra tu kar nedît. Di dawîyê da ez hatim Qonyê. Di xanekê da cî û war bûm. Li kuçe û kolanên Qonyê digerîyam, da ku ji xwe ra karekî bibînim. Di wê demê da min çend pêxasên Qonyê nas kirin. Yekî aqil da min, got:

– Li der û dorên Qonyê gelek kurd dijîn. Piranîya wan him oldar in û him jî dewlemend in. Biborîne ev gotina wan e, digotin him jî gelek exmeq in. Madem tu erebî, farisî, tirkî û kurdî jî dizanî, ger tu di nav wan kurdan da melatîyekê bi dest bixî, tê wek şah û padişahan bijî.

Yekî ji wan pêxasan ez birim, bi Hecî Cebâr ra dam nasîn. Min derdên xwe jê ra got. Tam di wê demê da Çawîş Axa, ji Hecî Cebâr ra gotiye, “Melê me mirîye, gelo tu dikarî ji me ra melekî bibînî.” Aha bi vî celebî em bi Çawîş Axa ra rastê hev hatin

û ez bûme melê we. Çîroka meletîya min bi kurtî wuha ye.

Bû tirqetirqa Samî, kenîya. Paşê pîyala xwe hilda, got:

– Wey tu li ser serê min, ser çavên min ra hatî meleyê delal. Vira mala te ye. Kingê dixwazî keremke were mala xwe.

Seyda û Samî, gelek şevan li ser sifra meyê rûdiniştin. Piyalên xwe li hev dixistin, dibû şingînîya pîyalan. Li ser rewşa welêt, li ser Kurdistanê, li ser heq û huqûqên kurd û ereban sohbet dikirin. Dewleta tirk rexne dikirin, ji bo azadî û serfirazîya millet, projên curbicur amade dikirin.

Munasebeta Seyda Evdîlfehî û Samîyê Sor, bala millet dikişand. Hinek sofîyan nerazîbûna xwe eşkere dikirin. Rojekê çend sofî çûne cem mele û jê ra gotin:

– Seyda! Di destpêkê da me ji cenabê te ra gotibû ku birazîyê Çawîş Axa meyxwur e, Xwedê nas nake, bê dîn û bê îman e. Tu çima diçî mala wî komunîstî? Divê cenabê te ne selamê bide wî, ne jî pê ra sohbetê bike.

Seyda şaşîka xwe serast kir, bi jê teke filozofî serê xwe bilind kir û bi dengêkî nermoke got:

– Gelî sofîyan! Me hemûyan Rebbil Alemîn xuliqandîye. Tu car jî bîr nekin, di nava her însanî da rehma Xwede heye, tîrsa Xwedê heye. Di

nav dilê Samî Begê da jî rehm û tîrsa Xwedê heye. Divê însanên oldar li merivên wuha ra alîkar bin. Dest bavêjin ku merivên meyxwur ji tarîyê derxin bîkşînin nav ronahîyê. Lê hûn çi dikin? Hûn wî didefînin, ji xwe dûr dixînin. Vêca kî ê wî bîne îmanê? Hele piçek sebir bikin, ez ê wî bînim ser rêya rast. Ew jî wek me ê rojîyê bigre, nimêjê bike. Hûn qet mîraq nekin, ez ê wî bînim îmanê.

Çend roj paşê Seyda û Samî, dîsa li ser sifra şerabê rûniştî bûn. Du şûşê şerab vala kiribûn. Serbest bûbûn. Seyda ji Samî ra got:

– Bira can! Ez dixwazim ji te tiştêkî bipîrsim.

– Keremke, bipirse.

– Tu ji hevaltîya min razî yî an na?

– Ev çi gilî ye Fetaş can. Bi rastî ez ji hevaltîya te gelek razî me.

– Vêca daxwazek min ji te heye.

– Keremke, bêje.

– Ev hevaltîya me, bala sofîyan dîkşîne. Sofîyên gund, guhên xwe fit kirine, me teqîp dikin. Ez ditîrsim rojekê bavêjin ser mala te. Me li ser sifra şerabê bibînin. Me rezîl û ruswa bikin.

– Ê pêşnîyara te çi ye?

– Ez dibêjim tu roja îne were mizgeftê, nimêj bike.

Bu tirqînîya Samî, kenîya û got:

– Ez, mizgeft û nimêj? Kuro Fet-

tah tu dîn bûyî? Her hal te hişê xwe wunda kirîye. Tu çi dibêjî, hay ji xwe nînî?

– Na bira can, ez hay ji xwe heme. Gava tu werî mizgeftê, millet wê çi bi-fikire û çi bêje?

– Milletê wê berde min, ji mizgeftê derxîne.

– Na, wusa nakin.

– Lê wê çi bikin?

– Wê bêjin helal be ji Seyda Evdîlîfetaş ra. Ladînekî wekî Samîyê Sor anî ser rîya Xwedê. Êdî tu kes li ser hevaltiya me nakeve şikê. Vêca em dikarin bi dilşahî, rehetî û bextewarî meya xwe vexwin. Kêfa xwe binêrin.

Samî piçek fikirî, got:

– Li min binêre Feto, ez mirovekî çil salî me. Heta îro min gav neavêtîye mala Xwedê. Min tu car serê xwe dananîye ser sicdê. Qusûrê nenêre, ez nikarim daxwaza te binim cî.

– Tu jî qusûra min nenêre, êdî ez jî nikarim werim mala te.

Samî û mele hefteyek hevdu nedîtîn. Herdu alîyan jî bîra hev kiribûn. Dixwestin wek berê werin cem hev. Sohbet bikin, meyê vexwin.

Roja îne bû. Mele sela dida. Gundî ber bi mizgeftê dimeşîyan. Kî diçû nav mizgeftê, bi awirên çavan û bi destan îşaret didane hev. Mirovê ku di safa pêşîn da cî girtibû, nîşanê hev dikirin. Herkes bi rastî gelek şaş

û metel mabû. Milletê nimêja nafîle xilas kiribû, benda mele sekinibû.

Seyda Evdîlîfetaş hêdî hêdî ber bi mînberê meşîya. Gava hate pêşîya cimaetê, dît ku Samîyê Sor jî ketîye safê. Hema çû destê wî hilda nav destê xwe, bi dilgermî got:

– Samî Beg! Tu bi xêr û silamet hatî.

Samî jî bi dilxweşî bersîv da, got:

– Tev xêrê bî seyda. Xwedayê dilo-van û mîhrîban ji te razî be.

Piştê nimêja îne, Seyda û Samî bi hev ra ji mizgeftê derketin derva. Millet Samîyê komunîst pîroz dikir. Ji seyda ra jî çavên xwe diqirpandin, razîbûna xwe dîyar dikirin.

Nimêjkirina Samî di nav nehîyê da wek bombek kimyewî teqîya. Bi rojan li ser vê bûyerê hat axaftin, şirovên cuda cuda dikirin. Hinekan digotin:

– Helal be ji Seyda Evdîlîfetaş ra. Heylo Samîyê komunîst jî anî ser rêya rast. Ew kire bisilmanekî xas.

Hinekan digotin:

– Seyda Evdîlîfetaş welîyê Xwedê ye. Saya kerameta wî, Samî bû bisilman. Dev ji meyvexwarinê berda. Kete nav refê bisilmanan.

Hinekan digotin:

– Heyran, tiştê wusa dibe? Wellehî di vî şixulî da fêlbazîyek heye.

Hinakan jî digotin:

– Ev elamata qiyametê ye.

Li ser propagandayên sofîyên Încovê, kerametê Seyda Evdîlfehtah, her diçû zêde dibû. Nav û dengê wî, şan û şohreta wî, di hawîrdorê Qonyayê da her diçû belav dibû, xurt dibû.

Ji Qûluyê, Kirşehîrê, Yunaqê, Polatliyê, Balayê, Qerecdaxê, Haymanê û Qonyayê, qefle qefle mirov dihatin zîyareta Seyda Evdîlfehtah. Hinekan mirîşkek, berxek an jî karek, an jî elokek dîyarî bi xwe ra dianîn. Mirovên dewlemend jî pere an zêr dîyarî dikirin.

Pir wext derbas nebû, serok û rêberên partî û komelên van bajaran jî hatin zîyareta seyda. Dû wan ra lîstikvanên sporê, esnaf, nivîskar, şanoger, hunermend û siyasetvan ketin rêzê.

Di nava çend mehan da li baxça seyda ji bo berx, kar, mirîşk û elokan cî nemabû. Sandoqa Seyda ya taybetî, tijî pere û zêr bûbû.

Dîsa êvarekê seyda û Samî li ser sifra şerabê rûniştibûn. Seyda ji Samî ra got:

– Bira can bereketa Xwedê zêde be, di hewşa min da êdî cî nema ku heywan bi rehetî bigerin. Ez ê ewqas heywanan çî bikim, çawa xwedî bikim?

Samî piçekî fikirî, got:

– De kerametê xwe nîşan bide Seydayê ezîz. Bixwîne û pif bike, bile mirîşk û elok bibin zêr û zîv, bikevin nav sandoqa te.

Evdîlfehtah kanîya, got:

– Bira can, dev ji henekan berde, ji derdê min ra çareyekê bibîne.

Samî destê xwe danî ser çonga Evdîlfehtah, got:

– Tu qet meraq neke, ez ê di nav hefteyekê da, ji derdê te ra çareyeke radîkal bibînim.

– Çareyek çawa?

– Di Qonyê da hevalek min yê celeb heye. Em ê heywanan teslimê wî bikin. Bila bifroşe û perê me bide me.

– Tu çawa îtmadê hevalê xwe dikî ku me nexapîne?

– Li min binêre Feto, ez dibêjim hevalê min e. Yanê mirovekî meyxwur e. Mirovên meyxwur, ne hecî, ne xoce û ne jî mele ne ku qûlên Xwedê bixapînin û wana bişêlînin.

– Kuro Samî, ez dinêrim tu kevir davêjî min ha!...

– Na, bira can, na. Te kingê qûlên Xwedê xapandîye? Gundîyên me yên exmeq têne cem te, dibêjin, „Me bixapîne.“ Tu jî dixapîni, mesele ev e.

Du roj paşê hevalê Samî hat, heywanên seyda gişk kom kir û bire Qonyê. Samî ji seyda ra got:

– Em ê sibê bi hev ra herin Qonyê. Îro ji cimaetê ra bêje, „Ez ê sibê herim

Qonyê. Li ser hinek meselên şerîetê bi miftî ra mişêwre bikim. Xeynê vê meselê, ji te ra jî surprîzek min heye. Ez wusa texmîn dikim ku li ser surprîza min, tu ê gelek kêxweş bibî.

Sibetirê seyda û Samî çûne Qonyê. Rasterast çûne dikana celep. Samî ew bi hev da nasandin û got:

– Îsmâîl can! Ev zîlam, melê gundê me ye. Seyda, ev jî hevalê min yê qedîm Îsmâîl e.

Samî paşê çavên xwe ji Îsmâîl ra qirpand û got:

– Seyda Evdîlîfeta ne xerîb e, ji terîqeta me ye.

Îsmâîl destê Evdîlîfeta hilda nav destê xwe, givaşt û jê ra got:

– Wey tu li ser serê min, ser çavên min ra hatî.

Paşê ji kasa xwe zerfêk derxist da Evdîlîfeta, got:

– Seydayê delal, ev perê heywanên te ye. Madem terîqeta me yek e, ez ji cenabê te komîsyonê nastînim. Hûn îro mêvanên min in. Qederê saetekê paşê em ê bi hev ra herin zikê xwe têr bikin. Hinek şerbet vexwin û piçek jî sefa bikin.

Samî zivirî ji seyda ra got:

– Madem saetek zemanê me heye, were em ji xwe ra hinekî bigerin.

Samî û Seyda derketin derva. Seyda got:

– Samî Beg, ez ê van paran çima bi

xwe ra bigerînim? Dibe ku ez wunda bikim. Ê baş ew e ku vana di banqekê da muhafaza bikim.

Samî got:

– Wellehî tu rast dibêjî.

Perên seyda teslimê banqê kirin û zivirîn hatin dikana Îsmâîl. Saetekê paşê, li trombêla Îsmâîl sîyar bûn, çûne Baxça Meramê. Li ber devê gazînoyekê sekinîn. Çend garson ber bi wan banzdan çûn û pêşwazî dane mêvanan. Îsmâîl ji yekî pirsî, got:

– Kuro Şemo, oda me hazir e an na?

– Belê ez xulam, min her tişt gor daxwaza cenabê te hazir kirîye.

Îsmâîl, seyda û Samî çûne di odayek taybet da rûniştin. Di orta odê da sifrek dewlemend hatibû amedekirinê. Li ser masê, mezeyên cur bi cur hatibûn rêzkirin. Di orta sifrê da şûşek araq hatibû danîn.

Mêvan li dor sifrê rûniştin. Şef-garson pîyalên mêvanan tijî araq kir. Bûz avête nav araq û avên wan. Paşê zivirî ji Îsmâîl ra got:

– Kek Îsmâîl, ez kingê kebabên we amade bikim?

– Tu çima disekinî, dest bi hazirîyê bike.

Garson ber bi aşxanê meşîya. Deh deqîqe şûnda di nav sinîyekê da xwarinên germ anîn. Îsmâîl pîyala xwe bilind kir û got:

– Ez pîyala xwe, ji bo şerefa mêvan û hevalê xwe yê ezîz radikim.

Bi hev ra xwarin û vexwarin. Qe- dera nîv saet paşê Îsmâil gazî şefgar- son kir got:

– Keçik hazir in?

– Belê hazir in!

– Çima disekinî, zû ewana bîne cem me.

Çend deqîqe şunda şefgarson sinîyek qelakirî yê mezin anî danî pêşîya mêvanan. Paşê du reqase û sazband hatin huzûra mêvanan. Saz- bandan lêxistin, reqase di nav sinîya qelakirî da reqîşîn. Her du reqase pîyal hildidan, bi destên xwe araq di- dane devên mêvanan. Car caran, ew hembêz dikirin û radimûsan. Yek hat li ber Seyda Evdîlîfetah leyîst. Seyda ji berîka xwe pere derxist, kire nav çîçikên keçikê û çîçikên wê givaşt.

Îsmâil devê xwe dirêjê guhê seyda kir û jê ra got:

– Seyda tiştên wusa neke.

– Çima, ev keçik o....

Îsmâil nehişt ku seyda gotina xwe temam bike. Jê ra got:

– Seydayê ezîz! Ev keçik reqa- se ne, ne fahişe ne. Gor torevanîya welatê me, ew dikarin meyê pêşkêşî mêvanan bikin. Dikarin mêvanan hembez bikin û ramûsin. Lê, mêvan tu car dest navêjine wana. Te fêm kir an na?

Seyda fedî kir û ji Îsmâil ra got.

– Biborîne, min nedizani ku li cem we edet wuha ye. Me di pavyo- nan da...

Îsmâil dîsa gotina seyda birî, got:

– Vira ne pavyon e. Ji vî ra dibêjin, “Oturak alemî.” Te got erê?

– Belê min nuha baş fêm kir.

Çar saet paşê ji gazînoyê derketin derva. Seyda destê Îsmâil girt, got:

– Bira can, Xwedê ji te razî be. Saya serê te, jenga guh û çavên min paqij bûn. Min ji zûva bêrîya van tiş- tan kiribû. Mala te ava, umrê te dirêj be.

Îsmâil got:

– Seydayê delal! Min gelek ji te hez kir. Tu kingê dixwazî keremke were, bibe mêvanê min.

Seyda got:

– Ez ji we rica dikim. Ji min ra nebêjin seyda. Navê min Evdîlîfetah e. Hûn dikarin bêjin Fetah. Na welle hema ji min ra bêjin Feto, hîn baş e. Zaten Samî ji min ra wusa dibêje.

Bû tîrquetirqa Samî û Îsmâil, kenîyan. Seyda gotina xwe wuha do- mand:

– Tiştê ku Xwedê dizane, çima ji qûlan veşêrim? Ger jin nebin, tu tama jîyanê tuneye. Xwedê kêmasîya wan nede. Yeka rindik jî nesîbê me bike.

Samî û Îsmâil bi Seyda kenîyan.

Paşê xatir ji hev xwestin. Îsmâil çû mala xwe. Seyda û Samî jî zivirîn çûne Încovê.

Li ser kerameta Seyda Evdilfetah, gelek tişt dihatin gotin. Xasma di nav kurdên Yunaq, Bala, Qûlû, Qerejdax, Polatli, Haymana û Kirşehirê da seyda wek ewlîyayekî dihate nasîn. Sibê hetanî êvarê pesnê seyda didan.

Hinekan digotin:

– Gava seyda li yekî dinhêre, di wê deqîqê da dibêje tu filankes î, ji filan derê yî û kurê filankesê yî.

Hinekan digotin:

– Bi dehan kor, topal, seqet tîn, bi saxlemî dizvirin malên xwe.

Ciwanekî digot:

– Kaptanê Qonyasporê çûbû zîyareta Seyda Evdilfetah. Sibetirê Qonyaspor du gol avête Bêşiktaşê.

Yekî digot:

– Di berbanga sibê da ez derketibûm derva. Min bala xwe dayê, seyda li ser xênî rûniştîye Quranê dixwîne. Min bi huşû ew temaşe dikir. Min dît nişkê va bû kevokek sipî û got “Piiiiir” firîya çû, di nav ezmanan da wunda bû.

Yekî dinê digot:

– Helbet difire. Di her rojên îne da, berê diçe Mekkê û Medîne tewaf dike. Paşê tê di mizgefta Încovê da îmamtiyê dike.

Kurdên Anatolîyê sibê hetanî

êvarê li ser seyda tiştên wuha digotin. Seyda û Samî jî her êvar li ser sifra araqê rûdiniştin. Car caran jî diçûn Qonyê, dibûne mêvanên Îsmailê celeb.

Rojekê piştê nimêja eşayê, dîsa li ser sifrê rûniştibûn. Ketibûn nav sohbetek şirîn. Di wê demê da du şûşe araq xilas kiribûn. Herdu jî serxos bûbûn. Dengê azana êvarê hate guhên wan. Seyda bi telaş ji Samî ra got:

– Bira, qusûrê nenêre. Milet nuha li benda min e. Divê ez herim.

Seyda çawa rabû ser pîyan, got girm, kete erdê. Hinekî sekinî, bîna xwe stand. Paşê çong da erdê. Bi zor û zehmet rabû ser pîyan. Çend gav avêtin û dîsa kete erdê. Samî jê ra got:

– Kuro Feto! Tu nikarî wuha herî mizgeftê. Were li cîyê xwe rûne. Bila gundî îro jî nimêjê nekin. Ma qîyamet radibe? Ma Xwedê wê ji sofîyên Încovê bixeyîde?

Lê seyda li wî guhdarî nekir. Rabû ser pîyan. Li vî alî û wî alîyî dihejiya. Lê dîsa jî derkete derva, çû mizgeftê. Milet benda seyda sekinîbû. Seyda çû li pêşîya cimaetê li cîyê xwe sekinî. Her du destên xwe danî ser guhên xwe. Nîyet kir û çû rukûyê. Xwe negirt deverû kete erdê. Êdî nekarî rabe. Cimaet li benda seyda bû ku serên xwe ji sicdê rakin. Lê ji seyda tu deng

dernediket.

Nihêrîn seyda deverû ketîye erdê, nikare rabe. Galegalek ket nav cimaetê. Yekî bi qîreqîr got:

– Yeqîn qîrîza dil e. Zû seyda li ser piştê dirêj kin.

Çend kes çûn Seyda li ser piştê zivirandin. Di vê demê da seyda vereşîya. Bîhnek pîs ji devê seyda dihat. Ciwanekî got:

– Kuro ev bîhna araqê ye. Seyda serxoş e.

Sofiyekî şeqamek li devê wî da, got:

– Kuro tulê kûçika! Tu çawa ji

ewlîyayê Xwedê ra dibêjî serxoş e?

Lê belê her tişt li ber çavan bû. Sedema ketina seyda, qîrîza dil nebû. Bêhna araqê li nav mizgeftê belav bûbû. Seyda nedikarî rabe ser pîyan. Dikire bilebil, lê kesî nedizanî çi dibêje.

Êdî cimaetê fêr kiribû ku seyda mey vexwarîye û serxoş e. Cimeat seyda avêt ser traktorekê, birin avêtin ser asfalta Qonyê.

Lê dişa jî di nav kurdên Anatoliyê da, gelek salan li ser ewliyatîya Seyda Evdîlfettah gelek tişt dihate gotin.

*Ev parçenivîsa li ser kurdên Anatoliyê û Încovê ji kitêba birêz
Yılmaz Çamlıbel ya bi navê **Tewlo** hatiye wergirtin.*

Bîrnebûn

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di **Bîrnebûnê** de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmançiyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Perdeya xeyalên tazî

rojan
xwe ji min vedişartin
şevan
xwe bi min dinimandin
hêrsa ewrên tarî radibû
asîman
di birîna kezeba xwe de
diqelişt
çirûskên stêrkan vedimirîn
heyv
di kîn û nefreta xwe de
ji nişka ve com dibû
hawîrdor
di toz û dûmaneke reş de
hatibû rapêçandin
çiya
di raperîna xwe de
diqêrîn
barana xemkêş
di hinavên min de melûl melûl
dixuşî
min
perdeya pencera jiyana biêş
li ser xwe digirt
hevîrê bîranînên şîrîn
tirş dibû
tabloyên dîwarên odê
di bêkesiya xwe de
bi îskeîsk digirîn
asoyê tenêtiya wêran
diqermiçî
bêçaretî û kovanên xwe
mîna şereba sor

bi qurtequrt vedixwim
ji şaxên dilê xapînok
pelên serxweş
diweşin
xew di tirsê rondikên janê de
difetisî
serê min
mîna şervanê çol û pesaran
tim di nav bela de ye
şevşevokên dirinde
mêjiyê xeyalên aram
dikuncirînin
di albûma demsalên derewîn de
wêneyekî rengvemiş me
rûyê giyanê min
bi kul û kederan
hatiyê boyaxkirin
bi tevna lezeta pêşerojê
şadiya salên têkçûyî
dihûnim
li koretariya xewle
qêrîna bêdengiyê me
li şikeftên tenha
bi kurtepişteke nependî
deng vedidim
di aloziya êş û nalînên xwe de
kamil dibim
kêla gora xwe ya derbeder
li ser piştê xwe
digerînim
bi lorîna strana dilşewat
bedena xwe yê tazî
dinixumînim

Xizan Şîlan

2010-06-02 / Stockholm

Şopên dema xatirxwaztinekê

Nuh Ateş

– I –

Rojek mabû ku Simo vi rê keve û here xerîbiye. Li gorê şîret û edetên hîngê, ew sewa xatirxwaztinê çûbû malên mermalî, cîran û hevalan xwe. Bi xwe da ketibû, te yê bigota, ew î ku ji ebediyê ra Beraniyê, gundê bav û kalan terk bikê. Carcaran, wexta ku wî çûyîna xerîbiyê di serî xwe ra derbas dikir û ji ber betaliyê lome û lêdan dibihîstin, ji xwe bi xwe ra digot, „ez ê herim û venagerim!“ Wî tedariyên xwe yên rewîtiya berve Elmanyayê kiribûn.

Wê rojê, ew pir bi dîqet li der û dora xwe dinihêrî. Çavên xwe yên gir û bi niherînên melûl li ser her tiştî digerandin, mîna ku bixwaze resmên wan li ser bîra xwe qeyit bike. Danê êvarê, ew bi tenê li maweyniya xaniyê ku ew bîst salan di ber vê tê da hatibû dunyayê û mezin bûbû rûniştibû. Girangiran çav li her derê maweyniye gerandin. Nihêrînên wî li ser her tiştê ku li maweyniyê bi ber çavên wî diket dadinişin û pêçekê li wê dibûn mîvan. Te digot, ew î dixwazê ku wana rind di çavên xwe ra kê, sewa ku ji bîr neke. Nihêrînên wî mîna yê bazirganekî ku mêl bi çavan kifş dike bûn. Bi vî awayî, wî tiştên

di maweyniyê da yek bi yek li bîra xwe mahr dikir: Meşrev, gumgum û helkeyên ava vexwarinê yên baqirî û li ser maseya çarkoşeyî di quncê maweyniyê yê jêr da. Li binî maseyê mîsîn û legan. Veqasî bejnemêrekî berve jor, pewrêzên textinî û bi niçikên hesinî yên kincdardakirinê mîna kemberekê diwarên maweyniyê dixemlandin. Di jur wan ra jî refên textinî û bi çirtik. Qaw û qacaxên (firaqên) qilê û neqîşkirî; siniyên zêd, zerikên xoşavê, çînik, çingil û dewaxên sifrê li ser refên textinî hatibûn rêzkirin. Ewana tenê rojên dewetan û sewa xatirê mîvanên navgiran ji refan dihatin xwarê. Paşê, wî beriyê nihêrînên xwe berve jêr kirin û li ser balîvên bi diwarên maweyniye hebstartî, mînderên rûniştinê yên rûber xalinî û kulavên li herdê yên bi çîn û motîfên ji çaxên kevn da mayî gerandin. Gava ku dor hate xalîyên dirêj yên li herdê rêxistî nihêrînên wî her ku çû giran bûn. Mîna ku ketibû nav deryakî rengîn, wî xwe li amance ahengî û xweşrengiya xaliyan pêçekê ji bîr kir. Serê xwe tozîkê berve jêr xwar va kir û destpê hûrlênihêrîneke pir bi

dîqet kir, te yê bigota, ew î ku hevde û gireyên xaliyan bihejmirê yan jî li şopa çîn û motifên van xaliyên ku bi desthunerîya jinan çêkirî digere. Bi dehan çîn û motif: Lefer, jîka sor, jîka reş, xençer, nîk, nîka sîpik, zik, lepikê sîpik, hemêlî, şîrikê hemêlî, alsêvik, çirtik, gol, pênc gol, pitpitik, kawik, herçik, gul, binçeng, qilç, firêt..! Çîn û motifên ku tê da sir û nîşanên kulturên kevn veşartine. Desthunerîyeke ku ji hezaran salan vir da ji nivşekî derbase nivşekî din bûye, lê niha, li Beraniyê gihêştîye qonaxa dawestîn û bîrbûnê. Desthunerîyeke ku jin, keçik û bûkên her malekê pê dizanîn û piçûkî da dihevîsîn û her sal bikar dianîn. Te yê bigota, çêkirina berhemên vê desthunerîyê li ser jinan hatibû ferzîkirin. Jinan dev li vê hunerê derdixistin. Desthunerîyeke ku hûr û mûriyê xwe pir û ji aliyê zimên da jî zengîn: Heriya şûştî û zîwakirî bişikine û bike kûlî, kûliyê bike hav, havê birêse bike rîs, rîs bipêçe bike gilok, giloke verişîne bike destî, destî biavê denê û areng bike û paşê ziwa bike û dîsa bike gilok, rîsî gilokê li birekê bipêçe û bibire û bike yan, yanê biavê ser du hevdeyan û her du serîyê wê berê berve jêr xwar ke û paşê ji jêr da di navberê her du hevdeyan ra derbas ke û berve jur derxe û grê de. Zo û fer, yek li pê yekê, bi hazaran grê tên avêtin. Tê bibejî, bi wan rabirdû û dahatû bi hev va tên girêdan. Mîna pir desthunerîyên din,

binetara vê desthunerîyê jî jîyana bav û kalên wan ya koçber û nîvkoçber bû. Jîyaneke li ser pîya û bi çûyîn û hatinên li gora demsalan. Zivistanê li germîyan û bihar û havînê li zozanên Kurdistanê kon vedigirtin û kerîyên pêz xwedî dikirin. Paşê, ji neçariye aware bûn û berê xwe dana deşta Anatoliyê û ji rêwîtiyekî dirêj û bi meşeqet bi şûn da, nêzikî dused salî berê, di çarçiveya siyaseta dewleta Osmanî ya bicîhkirina eşîrên koçber, li wir bi cih û war bûn. Qasî ku teyê bîra Simo, dayika wî, Almasa Alê, xwangên wî û bukên malê her sal geh li maweynî û geh li odeya sêr (istêr) û xaniyê tandirê tevn dadirtin, li gorê ihtîyacên malê xalî, ber, baliv, gelt, çal, têr û tûrên pirçêşîd bi zehmetekî giran, sebireke derwîşkî, jîrî û jêhatîyeke bê qiyas dihunandin. Edetekê bikêr bû, jinên mermalî û cîran û palî dihatin ser tevnê û alkarî dikirin. Keywaniya malê, Almas di karên desthunerîyên wekî tevn, teşî, dirûn, nanlêxistin û şîvkelandinê da pir jêhatî dihate nasîn û pesandin. De tu were, va bûn penc û şeş sal, wekî li pir malan, edi tevn li mala wan jî nedihate dagirtin. Çîreya vê desthunerîya kevnar, bi şan û şuhret hatibû kwîrkirin.

Dewraneke nû destpê kiribû. Xwemaliyên gundê eşîra Beraniyê li nava Anatoliyayê edin nedikanîn ku dewara xwe bi xwedîkirina pêz û cotkariyê bikin. Destengiyê destpê

kiribû. Ji koçberiya bav û kalan ya tijî tengî û tahlî ji Kurdistanê berî dused salî şûn da, koçberîyeke nû li ber derî bû. Wekî malbata Simo pir malbatên bi heyî jî pêz, dewar û hespên xwe yek bi yek ji dest derdixistin, difroştin. Berê rizqê wan li ber lingên wan bû. Ew ê ji keriyên pêz û cotkariya bi gihan bûn û kar û şixula wan li dor û paş gund, li ber deriyên wan bûn. Wan derd û tahlîyên xwe nas dikirin. Lê niha ew ketibûn rêyên nenas û li xerîbiye, li ber deriyên xelkê li rizqe xwe digeriyan. Tirs û tahlîyên dewarê ketibûn dilên wan. Derbider bûn, gundê xwe terk dikirin û diçûn bajarên mezin, Qonya, Enqere û welatên Ewropayê. Tengî û tahlîyên ku wan pê nedizanîn li benda wan bûn. Di seri da, yên ku diçûn xerîbiyê gîştik mêr bûn. Ji dê û bavan û ji jin û zarokan veqetîn li wan pir bi qahir dihat. Ji ber vê jî ew ê bi çûyîna xerîbiye di dudiliyê da bûn. Ji yên pêşî ku çûbûn Elmanyayê yek jî birayê Simo, Hesen bû. Di seri da, pir kes ên pir ji yên kevnepereşt û dîndar li dij derdiketin û digotin „neherin nav gawiran, nan û pereyên wan heram in!“ Henan jî digot, „yek vi yekî ra bibê, gawir, emeli pê nawe, ew ê bê wîjdan in û ew ê we bi sawûn kin!“ Van gotinên sist û pist hatin terikandin, wexta ku qefleya pêşî çû Elmanyayê û bi pere û udên bi qiymet vegeyriyan gund. Birayê Simo yê mezin, Hesen wexta ku cara pêşî

hatibî izinê, vi xwe ra ji mermalîyan ra udin anîbûn: Seko, îşligê naylonî, şalê qedîfe... Şalên qedîfe û îşligê naylonî yê bi sikûr hîngê li rewacê bûn. Hesen ji pismamê xwe, Hopoyê şorxwaş ra jî şalekî qedîfe anîbû. Wexta ku xelkê berve Hopo qala kumaş û qelîteya şalê qedîfe dikir, wî digot, „qet qale nekin, pir germ e, ba û serma qet tê kar nakin, ku ew min dibînin, xwe badidin û rêê di çola han ra diherin!“ Ev gotina wî li nav gund zû belav bû, bû pêkenî. Dora çûyîna Elmanyayê hatibû Simo jî. Wî ê xwe li birayê xwe, Hesen bigirta û biçûya Elmanyayê. Hesen wesandibû ku Simo were Elmanyayê û ew ê destî xwe bi ser ra bigre û alkariya wî bike.

Simo ji maweyniyê rabû û kete odayê sêr (istêr). Li ber sêr bîstekê dawestî, geh berva jur û geh berve jêr çav lê gerandin. Di odayê sêr da tiştên malbatê yên bedelgiran û cîzê keçik bûkan hatibûn bişûnkirin. Carekê û ducara ew bi ber sêr da çû û hat û pê ra jî destên xwe bi ser ra birin û anîn, mîna ku seriyê zarokekî mist de. Sêr li ser kulingê ya ku qasî nîvmetro bilind bû hatibû helçînîn. Beriyê kulingê bi xeleyeke hatibû nixmandin. Di biniyê kulingê da turê kincan, tûrê heriyê, tûrê bêriyê, gil, sawûn û dezgehen tevn û teşiyê hatibûn bişûnkirin. Li ser kulingê qat bi qat tişt hatibû helçînîn: Li binî hecal, gelt, xeleyên sîpîbelek, kulav, xaliyên kurt û dirêj, têr, ber, heqiv

û çal li ser wan jî nîvînên mîvanan hatibûn helçînin. Hingê, sêr mîna xemla malan û pîvana qelawiyê wan dihate hesibandin. Simo destê xwe yê rastê bi ser lihêfa bi rûberê herîrî ya ku bavpîrê wî yê bazirgan ji sefereke xwe ya pezfirotinê li Stembulê kirîbû, bir û anî. Bi nermî û sîsikiya rûberê herîrî rehetiyek li nav bedena wî belav bû. Zaroktiya xwe hate bîrê. Wexta ku ew î piçûk bû û bi xwang û bira û hemsaliyên xwe va zivistanê di hundirê malê da bi veşêrkirinê dilyîztin, wî tim xwe di bin vê kulingê da veşdişart. Bîhna gilê, sawûn, pirtû, cil û coran bi wî xwaş dihat. Di vê navberê da dayika wî, Almasa Alê sewa ku gila serîşûştinê pewe, kete hundirê odeyê. „Weeey, ez di dorê heta benî gorê, ez qurban, li sêr mêz dikî !“ Wê bi dengêkî kalînî got û pê ra jî dest di stûyê Simo ra birin, ew hembêz kir û berê di çîkiyê heniyê da û di pêy va, bingûhê wî bîhn û paç kir. Vê hembêz û paçkirinê xatîrxwaztin kire bîra wan. Her du jî kelegirî bûn. Lê wan rê nedan hêstiran, niherînen wan xwe ji hev badidan. Almasê cîlê berê xwe berve sêr kir û bi destê rastê xaliyekî kurt, heqîvek, geltek bi lawê xwe nimandin û pê ra jî, sewa ku kelegirîya xwe veşêre, bi şabûneke derew got, „aha vana para Simoyî min in!“ Di pêy va, da ser û got, „ku tu pê hatî ser û dixwazî, heqîvê vi xwe ra peve , ez a vê saetê

wê ji te ra derxim!“ Simo bi serî li rast û çep bakirinê nerazîbûniya xwe nîşan da û ji odeya sêr derket û derbasî maweyniyê bû. Wî pêçekê pa ku hol xewle biwe û dayka wî ji mal derkeve derva. Almas vi pê ket û li meweyniyê gihêşte wî. Wê ji paşilê xwe kinêrkek û moriyeke çava derxistin û bi Simo nimandin û got, „ez a îşev vana bi asterî ceketî te yê nû va bidûrim, wenda meke haaa, ez qurbannn, bi dê û bavê xwe va!“ Paşê çû tozîkek gil helna û derkete derva. Simo di pêy va mêz kir, hetanî ku ew ji derî vi derket. Telebetiya xwe hate bîra wî. Wî Mektewa Navîn û Lîseyaya Bazirganîyê li Qonyayê teva kiribû. Ew bi çend hemgundîyên xwe yên telebe va tevehev di xaniyekî kirêkirî da diman. Dayikên wan bi nowê ji bo çend rojan dihatin ser wan, xizmeta wan dikirin. Wekî hevalên xwe, wî jî ji ber kincên dayka xwe yê kurdewarî, xeftan, şar û kitana wê fedî dikir û nedixwazt ku vi hêla wê keve. Paşê jî poşman dibû, lome li xwe dikirin û xwe neheq didît. Dayika wî ya ku di kar û kirinên xwe da xumal. Dayika wî ya ku mîna çireya çavên xwe li wî û li zarokên xwe yên din mêz dikir, bi gotina hîngê, xwe sewa wan dikûşt û di tengîyan da destên xwe bi ser wan ra digirtin û ew bi nefsmîrî, nefspiçûkî û taybetên dinên rind yên wê çaxê, şîret û mezin dikirin. Yekcaran jî bi hîdet, azar û lêxistinê. Wê pir dixwazt ku Simo bixwîne û

bibe xwedîyê kar û mijûliyên bajari
û bilind.

Ji av û rûyên înkâr û vêqedirkirina
nasnameya kurdî Simo carna raste
serêşîyan dihat. Dema telebetiyê, wî
ji dixwazt ku mîna hevalên xwe yên
dine kurd nasnameya xwe ya kurdî
veşêre. Lê bi şîya nedikir, qirika wî
û awayê dengkirina wî kurdbûna wî
dida dest. Lowma ew ji mecbûriyetê
pir caran li nasnameya kurdî xwedî
derdiket. Wî xwe kurd dinasî û li ber
destê dê û bavên xwe yên tirkînezan,
mezin bûbû. Li ba tirkînan, li nava
bajêr û li mektewê nedixwazt ku
kurdbûna xwe zêde aşkere midefa
bike. Bi hevalên xwe yên kurd va bi
kurdî deng dikir. Mîna telebeyên din
yên kurd wî ji zêde hay je tarîx, ziman
û kultura kurdan newû. Lê bi hewêsa
zanîna li ser van mijaran bû. Ji av û
rûyên nerindî û neheqîyên li ser vê
mijarê carcaran teve mineqeşeyên tûj
dibû. Xortekî li ser xwe bû. Mêyldarê
fîkrên berve çepitîyê bû. Kihêl bû,
lê li amance neheqîyê zû sur û tûj
dibû. Wî navê Mile Mistefa Barzanî
bihîstibû û carna di rojnameyên
tirkî da di derheqa wî û berxwedana
wî xeberên neçê dixwandin. Navê
Barzanî wekî yê qehremanekî ku
sewa heq û huquqa kurdan derketiye
serê çîyan di serê wî da cîh girtibû.

Simo kesereke kûr kişand û berê
xwe da odeya qêtiş. Di wê da, qatixê
malê dihatê bişûnkirin. Wî çav li
çalên êrd, bulxur û nîsikan gerandin.

Çal li ber diwarê rastê yê vê odeyê li
ser kulingeke nêzikî herdê hatibûn
rêzkirin. Ji çalên êrd ra digotin deng.
Ew ê pir giran bûn. Wextê ku li aşê
gund ard berdidan wan, ew pîr pît
dihatin avandin. Kaşkirina wan ne
karê her cihêmerekî bû. Ew ji aşê
gund bi erebeya hespa dikişandin ber
malê. Paşê, ji erebeyê diwirandin
û li ser piştê merivên pir bi quwet
bar dikirin û bi şêklê kaş dikirin
hundurê malê. Simo berê xwe berve
diwarê hêla çepê kir. Li ser kulinga
li vê hêlê kodika tijî nanê sêlê yê
ku ji hefte carekê dihata lêxistin û
têra dwanzdeh seriyên malê dikir;
dê û bav, sê law, sê keç û du bûk û
du zarokên wan, hatibû bişûnkirin.
Wî kûjê hecalê ya ku bi ser nên da
xistibûn berve jor helna û bi ser
nên ra mêz kir. Bi sedan nan tê da
wû. Zehmetî û şabûniyên çêkirina
nanê sêlê yek bi yek li ber çavên wî
rêz bûn. Nanê sêlê ji bi destê jinan
dihate çêkirin û çêkirina wî danekî
diajot. Li xaniyê tandirê, yê ku li
kêleka xaniya malê bû, ard dikirin
teşteke mezin, av li ser dikirin û sewa
meyandinê tozkek hevîrtirş diavêtin
nav û bîstekê li hev dixistin û distran,
dikirin hevîrê run. Ku hevîrê run
gavekê dadiwestî û tîr dibû şûn da,
ew bi her du destan careke din bi ser
ra diçûn û distran. Du an sê jinan bi
hev ra nan lêdixistin: Yekê li ser textî
nên bi duxê hevîr vedikir û diavête
ser sêlê, yekê hevîr dikire gog li ser

hevkinê ku li ser têxt heldayî rêz dikir, yekê jî ardû; kix, kês, xişik diavête tandirê, pê arê binî sêlê şên dikir. Bi rû da jî, wê nanê ser sêlê werdigerend û ku dipêjî şûn da, heldina û li ser hecalê nên heldiçinî. Rojê nanlêxistinê Simo û zarokên malê yê din benda xaniyê tandirê bernedidan. Bîhna nanê teze ya ku vi ser xaniyê tandirê diket û belav dibû, bîza wan diçûye. dilê wan pir diçû kiloran. Ji bo wan roja nanlêxistinê ya kiloran jî bû. Keywaniyên malê pirçeşîd kilor çêdikirin: Kilorên bi penêr, bi hek û bi qwarne û yê nav sêlê ê bi rûn. Simo ji yê bi qwarne û bi hek pir hez dikir. Wê rojê, kûçik, pisik û mîrişk jî li ber derîyê xaniyê tandirê kom dibûn û sewa ku parîyek nan vi dest xî di dor û paş zarokan ra çerx dibûn û pir bi dîqet, mîna heywanê ku benda neçîrê dipê, çavên xwe ji dev û çavên wan nedibirîn. Di odeya qêtx da, li hêla koda nê, sandika qatixê şîv û xwarinan; rûn, penêr, çinîgoştê qewirandî, mit, reçel hewû. Rûn û penêr di teneke, kod û kûzan da wû. Berê, rûn û penêr yê ku bi dest dihatin çêkirin di yarê pêz da diparaztin. Mit dikirin hîz, yarê bizinê. Penêre hûr dikirin qewirme, yarê verûtî. Va penêra ji şîrê bi rûn û germkirî çêdikirin. Ev şîra bi givrikê di hate meyndin. Givrik ji şîrê ku di şîlavê berxa virînî da gilebigile bûyî peyda dikirin. Goştê parçekirî di xwê werdidan û hîşk dikrin û paşê

dikirin sersî, hurê pêz yê pakkirî û bi darde dikrin û zivistanê ew dikirin ber şîvan. Ard jî dikirin yarî pirtik û bi darda dikirin. Li ber diwarê pêşî tûrikê xwê û destarê xwêherdinê bişûn kiribûn Di kûncêkî odeya qêtx da li ser kûlingeke textinî ocaxê gazê û fraqên şîvê û dezgehê çay û qehweyê hebûn. Di qûncêkî din da jî meşka rûnkêyî nê bi diwêr da hatibû bi dardakirin û kêrî û dezgehên wê yê din hatibûn bişûnkirin. Xwemaliyên gundê Beranî ji vî rûnî ra digotin, tort. Li ba wan di ser rûnê kêyî ra xwaştir rûn tune bû. Berê şîv tenê di xaniyê tandirê da dikelandin. Bi derketin û hatina ocaxê gazê edi şîv li xaniyê malê, di odeya qêtx da jî dikelandin. Bi îcadkirin û hatina ocaxê gazê tozîkê qeramê jinan sivik bû.

Anatoliya di çaxên kevn da şûn û warê şaristanîyên bi nav û deng bû. Pir şer û wêranîyên mezin jî li wir qewimibûn. Herçiqas Anatoliya ji berêberê da cîh û warekî kêmbaran be jî, bi deşt û banên xwe yê fereh û bê dar û daristan sewa xwedîkirîna pêz pir bi kêr û bi bereket bû. Ma hespên kê herdê Anatoliyê pêkol nekirin û kê li deşt û banîyên wê cografya qedîm kerîyên pêz neçêrandin, serma û germa wê yê bi tîn nexwarin?! Ejdadên kurdan jî tevê, xelkên çaxên kevn yê wekî hatî-hîtî, xaldî, horî-mîtanî, med, fars, yonan, romî, kelt-galat,... li

dešta Anatoliyê pez jî xwedî kirine, bi taybetî jî frîgiyan. Tarîxzanê Yonan Herodot dibê, ji alîyê xwedîkirina pez da di ser frîgiyan ra tu kes tune. Fîrîgi bi xalîyên xwe yên rengîn jî meşhur bûn. Bi hezaran salan ji wan bi şûn da, li eynê cîh û warî, Beranî jî tevê, bi dehan eşîrên kurdan eynê kevneşopî bi awayekî rêk û pêk domandin û bi sedan sal, bi sedan kerîyên pez xwedî kirin û bazirganiya ber û berhemên wan kirin. Meriv dikane bibê, ew xelqeya dawî ya vê kevneşopiyê bûn. Bavê Simo, Reşoyê Kulik nedixwazt ku malbata wî dest ji vê kevneşopiya bav û kalan, xwedîkirin û bazirganiya pêz berde. Ne bi dilê wî bû, gava ku malbata wî qerar da û havîna îsal pez ji dest vi derxistin û bêl bi bêl firotin û tenê beranek û panzdeh mî cihîştin, ew pê ragerî, vedilîst, nexwaş bû û kete nav nîvîna. Di wexta xwe da merivekî bi dest û mist bû. Lê niha bûwû kalekî û kesî bi guh pê va nedikir. Jina wî û her du lawên wî yên mezin dengê wî di xwe nedigihandin, di ber wî va diwûn. Wan bi a xwe kirin û pez ji derîyê xwe vi derxistin. Berî mirinê, Reşo weşiyet kir û got, „ku ez mirim û ketim tirbê, şûne kevirêkî, hestîyê serîyê beranekî bidin ber balgiyê min. Ku we wer nekir, ez heqî xwe li we helal nakim!“ Wî ji pêz û xwedîkirina wî pir hez dikir. Ku mîyek nexwaş diket, ew ji vi ra nexwaş dibû. Gava ku pezê wî yê nêr dikete rêzê û diçerî

û dengê şîrpeşirpa çêrîna wî dikete guhê Reşo, ew pê şad dibû. Ji av û rûyên firotina pêz da bi matem bû. Yekcaran, wextê ku Simo berve wî geh bi yarenî û geh jî bi sahî digot, „ez neherim tu deran, ez ê şivantîya pezê bavê xwe bikim!“ ew pê şa, palpalî dibû. Simo li navberkê mektew di nîvî da cihîşt û hate gund û şivantîya malê bavê kir. Bavê hîngê ew pesand û bir vi ewra xist. Di kurikîtiya xwe da, dilê Simo dikete şivanên şîp û şidandî. Wî ji şûler, hacet û kincên wan yê şivantîyê hez dikir: Ji ço, kulav, kevrkonî, kevirê heste, kêr, bizbên ... Ji kûmê wan yê rîsinî û serî bi toqaz, gore û dolaxên rîsinî û çarixên ji çêrmî ga ... Ji pezhejmartina wan ya bi zo û fer û ji katkirina çêrok û serhatiyên wan ên tijî fîgûrên bixofî, ejderha, heftar, dêvê kwîr û yê heftserî û cengawerên wêrek û jîrek ... Ew bi dengê bilûra wan û zaravayên Memê Alan, Hemê Musê û Cembeliyê Mîrê Hekarî zîz dibû. Li amance zanîn û nazirîya şivanan mat dibû. Wan bi sedan pezê gewr û berxên wan yên ku ji pir hêlan da wekî hev xûya dibûn, nas dikirin. Wan ew di nîşanên pir piçûk ra nas dikirin û bi nîk û şanikên li ser çavan, perê bi guh, guliyê bi stû û reşikê li dor û berê dev û poz ji hev derdixistin. Simo ji tecrubeyên xwe pê çetinayiyên şivanî, pezxwedîkirin û cotkariyê jî dizanî. Kar û mijûliyên ku ji bav û kalan da mayî û niha ji

ber vê xudanî û xopana sîyaseta li ser van mijaran li ber mirinê ne. Malên bi heyî yên xwediyê keriyên pêz ji xwe ra şivan radigirtin û heqê wan ji bo şeş mehan dibirîn. Şivan kesên xizan û mihtac bûn û di bazariya li ser heqbirînê da hêla hêjar bûn. Lowma ku xwediyê pêz çî dida, ew pê razî dibûn. Pîvana heqbirînê wijdana exeleran bixwe wû. Şivan şeş mehan, şev û bi ro li dîndarê wan dadiwestîn.

Simo ji odeyeke derdiket û dikete yeke din. Ji odeya qetix derbase odeya mîvana bû. Binî û dîwarên wê bi xalî, balîvên bi nixmandiyên hunandî û neqîşkirî û minderên rengîn hatibûn xemilandin. Wî çav li her derên vê odeyê û li ref û dolawên wê gerandin. Bîstekê li her du lewheyên bi dardakirî yên ku resmê keçîka şahî mara û yê hz. Ibrahim teve lawê xwe yê ku sewa qurbankirinê çavgirêdayî tê da hatibûn bişûnkirin nihêrî. Di navberê her du lewheyan da, çireya gazê a bi şûşeyê camînî yê ku her roj dihate pakirin û li ser refeke piçûk hatibû bişûnkirin. Paşê ew kete odeya raketinê ya ku ew tê da teve xwangên xwe yên ji wî piçûktir û dê û bavê xwe va radiket. Li kulav û xalîyên li herdê rexistî, li balif û minderan û li dolawa mezin a li ber dîwarê dawiyê odeyê ku tê da nivîn heldiçînîn nihêrî. Yek bi yek çû ber her çar pencereyên vê odeyê yên berve rojhelat û başûr û bi perdeyên bi çînenî pirçêşîd û rengîn. Di pencereyan ra her wextê tavên

rojê xwe digihandin hundirê odeyê û ew runî dikirin, camên pencereyan dibiriqandin, reng û motifên xalî, balif û minderan tebrûsandin. Simo şikbir ku ew yekcara di van pencereyên bilind û fereh da rûdinişt û li hewl û hewldanên li derva sêr dikir: Teperepa çûyîn û hatinên merivên malbatê û teqereqa şixula wan, qîrvirçûya keçîk bukên meheleyê yên ku berve naxirê û golikan diçûn, meşîna rêwiyekî peya yê ku hacetekî cotkariyê li ser mil û dêhûdêha cotkarekî ku li erebeya hespan sîwarbûyî û lîngelînga erebeya wî, kîsekîs û tûvetûva şivanekî ku belek pez dida ber xwe, qiteqit û qulteqlta mîrîşk û çulîqan, kalîna berx û mîyan, qîrinî û wêrinîya zar û zêçan vi ber çav û li guhên wî diketin. Van deng û resmên zindî gîşt hemahema li her rojeke bihar, havîn û peyîzê li meydana li pêş xaniyê Reşoyê Kulik ya fereh û ku tê ra rêyek derbas dibû, diqewîmin û mîna filimekî zindî di ber çavên wî ra rêz dibûn. Rojê ku ew di pencerê da rûdinişt û paşê diçû nav hevalan û ji hevalan yekî ji dipirsî û digot, “tu îro pir xay nekirî, tu li ku derê wû yî?” Wî lê vedigerand û digot, “min li mal bedewa li filmekî sêr kir! “. Ew hewesdarê filimên sinemayê bû. Wextê telebetîyê li bajarê Qonyayê ew pir diçû sinemeyê û nîvîyê xercîyê xwe li sinemeyê dida. Di saye filman da wî dunyake cîhê û jîyaneke bajarî

nas kir. Xanîyê malê li perê gund bû, jê wê da xanî tunebûn. Hat ber pencereyê berva rohelat û gavakê li derva mêz kir. Nihêrînên wî bi ser deşteke, bi gotina mezina, dûz mîna Xorasanê da xûşîyan û hema gihêştin herda ku erd û ezman bi hev dibûn. Li vê hêlê xaniyê malê Simo teve hevalên xwe dilîztin. Neh û deh gavan ji xênî dûr, kevirêkî reş û qilot hebû. Kevirêkî giran bû, bi dest û pîyan bi şîya nedikirin ku wî bilevînin. Kevirêkî xas, ne mîna kevirên din bû. Te digot, ew î ji zemanê berê da maye yan jî ji ezmên da, ji dunyake din da lut bûye û hatiye xwarê. Xortan ew ji xwe ra kiriwûn qadi yan jî qele, wexta ku bi hotê (gog, top) ço û qîtê qêdi dilîztin.

Wê rojê, sewa xêra çûyîna Simo ya xeribîyê qurbanek serjêkiribûn. Kavirêkî çê. Êvarê mermalî, cîran û nas hatiwûn wesandin. Rabûn û rûniştinên kultura xwarin û dawetan hîn jî li gorê qeydeyên eşîrî yên ku hukmê mêran li ser bûn. Çar ji mêran û dudu ji jinan ra, ji hev cihê şeş sifra dêynabûn. Goştê xwaş û bijartî çû ser sifra mêran. Li ser sifreyan şorba meyrîrê, goştê kelandî û surkirî, zadê bulxur, peqleyên gewr û xoşav rêz kiribûn, li hêlê jî nan û pîzav. Ji şîvxwarinê bi şûn da, mîvanan xatirê xwe xwastin û çûyîna Simo xêr kirin. Edet bû, mermalîyan pere kirin berîya Simo.

Tarî hîn nû ketibû herdê û

heyamekî ji hûnikiya şevên peyîzê dagirtî û ewrî hewû. Simo xwe zû vedizî û ji xaniyê malê derket û girangiran berve axirê hespan çû. Bi rê da, berê çû li ber qelaxa kermeyan dawestî ya ku bi tepikan hatibû nixmandin. Qelax ardûyê malê yê zivistanê bû û bi şekla xwe mîna piramidê misirê û xanîyên kumbedkî yê bajarê Ruhayê hatibû danan. Wî pêçêkê pişta xwe da qelaxê û sekinî. Paşê, berve axirê hespan gav avêtin. Di navberê xaniyê tandirê û axirê hespan da, li ber soqiyê ku tê da kuçik malê yê pêz, Devreş yal dikirin dawestî. Yal ji lihevexistina avê kêmgerm bi êrd va çêdikirin. Simo Devreş ji cewrîkîyê da nas dikir û jê hez dikir. Ew pê şa dibû. Wî ew dida bezandin û kiş dikir. Nan dida wî. Sewa ku ew xwe helbiavê parîyên nêr berve jur diavetin. Devreş î gir, cansivik û nov bû. Di wexta wî da gurên çolê tu avil nedikirin û nezikî kêriyê pêz nediwûn. Şivanan digotin, li çolê pêz bi ser Devreş da berdîn, tu tişt pê neyê. Wexta ku Dewreş dana bazirganê ku pezê malê standibû, Simo pir pê êşîya. Ew gihêste ber derîyê axirê hespan û gireya benê ku pê derî giredayîbû verişand û kete hundir. Hesp tê da tune bûn. Ew du û sê mehan di ber vê hatibûn firotin. Du mehîn bûn, yekê şê yê din kûmet bû. Ya kûmet canîyekî xwe hebû, yekî kûmet û henibeş. Simo şahîdê zayîna wî bû. Wî jê pir hez dikir,

gerdanekî bi morîyên kesk, kepiskek û zengilekî piçûk û qilotik bi stûyê wî da kiribû. Axir şeverş bû, Simo xwe li kutegên darînî yê êxir girt. Bi vî awayî gihêste ber kurnê hespan yê bital. Pêçekî li wir dawestî û destên xwe li nav kurnê hespan gerandin. Canîyê kûmet hate bîrê. Wî gîyayên herî xwaş didan ber wî. Carna li vir, dest di stûyê wî ra dibir û henîya wî ya beş, alîjurê bivîlan û serçavên wî paç dikirin. Bi hewê li kûnhelavêtin, bez û bazdanên wî yê li ser merg û çîman sêr dikir.

Ew ji êxir derket û berva goma pêz çû. Deriyê gomê kilît bû. Li ber derî bîstekê dawestî. Gomeke mezin bû, sed û sed û pencê mî tê da bişûn diwûn. Niha tenê panzdeh mî tê da bûn. Di qeliştankên deriyê gomê yê textinî ra dengê kayîna wan û bîhn û bexa mîz û rîxa wan dihat Simo. Zivistanan pez dikirin gomê. Binîyê wê tim avhûskî dibû û sewê ku zîwa be, kongê zîwakirî li ser dikirin. Gom li ser şeş stûnên darînî disekinî. Li gorê mîmariya wexta xwe, diwarên wê ji binî da veqasî niv metro ji kevîran û ser wan jî bi kerpîçan hatibûn danan. Banê gomê bi dar, qamiş, ka û şoraxê hatibû nixmandin. Kuncêkî gomê biharê ji berxan ra dikirin koz. Li kuncêkî din, li ser refekê hacetên qusaîyê, herbing û benê nigî pêz û kodika qetrana birînan dihatin bişûnkirin. Di diwarê gomê yê pêşîyê da teqa qurqê hewû, tê da mîrîşk

diketin qurqê. Ku wextê xwe dihat wan hekên xwe kilç dikirin û çelikên xwe yek bi yek jê vi derdixistin. Simo jî tevê, kurikên malê xêr bi wan nedikirin. Hez dikirin ku wan sur bikin. Gava ku destê xwe berve wan dirêj dikirin, qîjinî vi ser wan diket. Bi reflekseke xwezayî xwe gije wan dikirin û li hember destdirêjîya wan xwe û hekên xwe diparastin. Bi hewl û li ber helnana wan zarok dikenîyan. Zivistanan malê ji kermeyên gomê yê qalin û pît bigihan bûn. Ew ardûyê malê yê zivistanê bûn. Xişorê arî kermeyan yê kiz pir bi tîn e. Biharê kerme bi bêlê bi şekla çarkênarî radikirin û li derva li ber tavê ziwa dikirin û paşê dikirin qelax. Bîranîyên zaroktî û xortanîya Simo hatin ber çavên wî. Di zaroktîya xwe da, wî bi birayê xwe yê ji wî mestir va bi nowê diçûn ber berxan. Di xortanîya xwe da jî havînan carcaran şivantiya peze malê bavê dikir. Biharê gomê bital bû, pez bi ro diçû çolê. Simo bi heval û hemsalên xwe va bi ro, di gomê da dilîstin. Vi lîstika di gomê da ra digotin, motmot. Lîstikvan dibûn du hêl. Ji terefdarên hêla ku bi pêkirinê serketî dibû her yekî xwe bi stûnekî gomê digirt û hewl dida ku xwe bi lez ji stunekî bigihîne stunekî din. Gava ku wan dixwazt ji stunekî bazdin yekî din, terefdarê hêla din jî dora wan hewş dikirin û hewl didan ku destê xwe bi wan bikin. Lîstikvanê ku destpêbûyî

dimir. Kingê ku terefdarên hêla ku xwe bistûngirtî gîşt dimirin, hîngê dora bistûngirtinê dihata hêla din. Li paş gomê birên gênim û cê hewûn. Peyîzê genim û cê di wan bîran da diparaztin, hetanî pozê biharê. Li kelekê gomê, korta banandinê ya mîyên neban hewû. Mî hebûn xoşban bûn, wana berxên mîyê din jî berdidan ganên xwe. Lê mî jî hebûn neban bûn û berxên xwe ber nedidan ganên xwe. Korta banandinê mîna tîrbekê dihat kolan. Tê da, mîyên ku li berxên xwe nedibanîn, li berxan dibanandin. Di serî da, mî çend cara di dor hevra çerx dikirin û heş li serî dibirin. Paşê, ew dikirin vê kortê ya ku veqasî metroyekê kûr bû. Berxa wê jî, berê pişt û teriya wê di mîza dayika wê didan û tozikek xwê jî bi ser ra diweşandin û dikirin cem wê. Kortê teng bû û mîyê nedikanî ku xwe tê da çerx bike û mecbur dibû ku li berxa xwe bibane. Simo gavekê li meydana li pêş gomê ya fereh gerîya. Meydana ku pez lê dan dikirin û jê ra digotin, Meydana Hozgerandinê. Berx ji kozê berdidan nav mîyan, ew û dayikên wan li vê meydana li hev digerîyan. Sewa ku hevûdû hêsan bibînin, merivên malê ew didan ber xwe û tozîkê diajotin, digerandin. Lowma ji vê merasimê ra digotin, hozgerandin yan jî hozajotin.

Simo destê xwe dan ser kenarê kevirê dên yê li kêleka xaniyê tandirê. Kevirê geyr û pan, veqasî metrokê

bilind. Kevirêkî pît û hîşk wû. Ji jur da, mîna kurnekî hatibû kortkirin. Li peyîzan, jinan tê da bi dankut dan dikutan. Bi ser xaniyê tandirê va gerajek hewû. Pêşiya wî ji hev kiriwû. Tê da makîneya zevîya ya ku bi çerxê dişuxilî û bi hespan dihate kişandin û dezgehên din yê cotkariyê, gasin hatibûn bişûnkirin. Bi hatina makîneyên zeviya yê modern û trektoran va dewrana wan bi dawî bûbû. Mîna yê di ber wan, gasinê darînî û dasê, ew jî niha di bin xwelî û xubarê va bûbûn û li benda bîrbûn û wendanbûnê bûn. Va bûn çend sal, ew êdin ji gerêj dervediketîn, çûçikan û mîrîşkên malê geh li ser wan dadînîştin û geh jî li germê havînê li sî û kendalên wan vedisiyan. Simo nêzikî gerêj bû û cara paşiyê, di tariyê da çav lê hacet û dezgehên tê da gerandin. Bîhna zîrçê mîrîşkan jê dihat.

Wî dil hewû ku di ber çûyîna xerîbiyê here ber mala dilketiya xwe, Nura dotmam. Dixwazt ku ji dûredûrê da be jî xatirê xwe ji wê bixwaze. Di çardeh salîya xwe da dilê wî ketibû wê. Wan piçûkî da ji hevûdu hez dikirin. Li herdê Simo, Nurê xezala Beraniyê û neqîştira dunyê bû. Wan pir caran bi îşmaran peyam digihandin hevûdu: Bi serîbakirinan, bi nihêrinên di bin çavan ra û bi destdayîna ser por û bîskan va. Wan xwe ji hev ra çêdikirin. Yekcaran xwe vedidizîn û hevûdu li kendalê

xewle yê ku wan navê Kendalê Dilketiyan lênabû didîtîn. Nûrê bi guliyên hunandî, bi morî û mircanan xemlandî û bi fîstanê xwe yê reşbelek û pîştâ sor li navê dihata kêndêl. Tirs û kelecaneke xwaş li nav ruh û canê wan belav dibû. Li wê derê, ew xoşbext dibûn. Çok li ber çokan, mîna ku dibên, wan dev dikirin devê hevûdu û gîlyên xwe dikirin ber hevûdu. Nihevse wextê ku wan li vî cihê xewle bi destê hevûdu digirtin û hevêsa destên wan bi hev dibûn, ew ji xem û derdan dûr, ji eşqa ra difirîn û diçûn qatê hefta yê ezmên û li nav xewn û xeyalên şîrîn digeriyan. Wan şor dawûn hevûdu ku ew ji xêyîrî bihev ra bi kesekî din ra nezewicin. Mîna ku tê gotin, qedera wan neçê derket û dilê wan neçû serî. Dê û bavan, sewa xatirê mal û milk, Nûrê bi zora xwe dan Kindo yê mêrebî. Dayika Nûrê got, “ez a Nûrê xwe ya gewrekhal li Kindo mahr kim, ew ê Nûrê hetanî stû tijî zêr ke!” Ji vê mêlê da, bavê Nûrê, Hecî jî ji jina xwe nedima. Qala bexîliya wî dikirin. Digotin, li dohla birazîyekî xwe, wexta ku bûk ji mala bavê derxistine, bi rê da, li gorê edeta hingê çend xort û cahîlan, dar û benê dardakirinê di desta, rê li qefleya bûkê birîne û xelat xwaztine. Apê zêve, Hecî nexwaztiyê ku xelatê bide, destê wî neçûyê berîyê. Ji ber vê, xorta ew heldana ser dêr. Li wê navberê, mezinê qebileyê hatiye û vi xortan ra gotiye, “Hecî wunin xwarê,

ez ê xelatê we bidim”. Hecî li jor, li ser dêr bang kiriye û gotiye, “Na na, keko tu xelatan nede, şûna min ê rehet e!” Simo bi dayîna Nûrê, gotin û tewrên dê û bavên wê pir êşîya, pê dilşikestî bû. Wî kiriwû sêriyê xwe ku Nûrê birevîne. Fikra revandinê avite ber wê, lê ew qanî newû. Ew bi ber dil da çû û li ber geriya, lê wê dîsa jî dil nekir. Dergîsta yekî din bû, newêrî. Bi ser vê da, Simo li wê sûva hat û bi salan vi ra deng nekir.

Şevereş bû, mîna ku tê gotin, çav û çavan hevûdu nedîtîn. Tê yê bigota, erd û ezman bi rijîya sêlê hatine meyandin. Simo li ber mala dotmamê, ji dûrê da çav berdan pencereyê, bi omdîya ku cara paşî li ber runiya çireya gazê qet newe sîya Nûrê bibîne. Wî nedizanî ku li wir çiqas ma. „bi xatirê te Nûrê, ji ebediyê ra!“, di ber xwe da got. Nîvê şevê vegeriya mal. Dayika wî vi ra da hev û got, “ma tu li ku mayî, tu ê siwê bi rê kevî, ma te qe negot nas û cîran ê werin min biwînin û çûyîna min xêr kin? Tu jî çûyî gerê, eyba reşe giran!” Wî derew kirin û got, “ez çûm ba hevalên xwe, min xatirê xwe ji wan xwazt, çir bûye!” „De zû ke, here rakeve, ez di dorê! Siwê, mermalî û cîranên werin te biwînin”, Almasê bi dilekî xwaş got. Wê şevê Simo rehet raneket.

Paşî heyê

15.11.2011

Bêdengiyeke bêdeng

bêdengiyeke bêdeng
dîrokeke bi birîn
birîneke vekirî ye
behra wanê
siwarên kor ê axê dilerizîne
erdî wek darê gula sor ba dibe
di şopên pêkên siwarên kor da
meri nikane
di nav avên baranan da avjeniyê bike
çavên dişewitîne
destên dişewitîne
zimanên werimîne
were
di perekî tarixê dûnê re bigre bermede
feqên tarixê ê di birûskên biharê da veşartine
ewrên sirên azmanê aşîkar nekine
hemî rêwîti yê bi gavekê dest pê dikin
xwedîyê kerwanê rojê li xwe pêçaye
û tîrêjên rojê ji xwe re kirine pênuş
û mêrdewan û yî berve roja sibê diherike

Seyyî Doğan

dema ku dayîkan
porên keçên berzewac tûnîn
mejoyên biharê yên teze
di nav guliyên wanan da dihilîstin
û di kûrîyê çavên wanan da
çemên sor
û zelal diherikîn
li şevên biharê aram û hêşin
pêtîyên qedahî min
zimanê min dişewitandin
û avên cîwanîyê
kevîrên li ser rîyan dihêlandin
tu kesî navên keçan wek min nedinivîsî
tu kes mina min
li kolan û kuçan nedigerîya
tu kesî sîhên xanîyên ji kerpîçan
wek min xemgîn û dramatik nedidît
tu kesî axa gundê xwe
wek min
bi salan
di bêrîka xwe da veneşart
hesebê barê min nayê kirinê
giranîyê xwe yê di hundirî min da ye
wey lo wey lo
bedena min
li welatên dûr
li welatên xerîb kevn
û ruhê min
li xelika kal bû

Sevdi Doğan

Rojên teng û parvekirî

Mem Xelikan

Bilo çavên xwe vekirin di hucreke tarî de wû. Di DAL'ê de wû. Serê wî li ser juniyê Beko, dev û didan tijî xwîn bêhal ketibû. Ji îşkencê şuva anî bûn avitiwûn wira.

Di hucrê de pênc meriyên din hewûn. Beko dest û serçevên wî yên bi xwîn û bîrindar paş dikirin. Herçar hevalên din di navbera xwe de diaxifin.

Ji rojên¹²ê îlonê yên tarî wûn. Ji hucrên doralîyan de qîr û bar û dengên nalînan bi şevat dihatin guhên wî. Hêdî hêdî di hate xwe. Li navberê çavên xwe vekirin di cihê ramedî de di jor xwe re mês kir, Beko dît û ew nas kir. Endamê Komaleke kurdan, ya Bilo bi xwe ne endamê wê bû. Komalên ew endam, herdu jî bi navê kurdan hatibûn damizarindin û xebateke kulturî û demoqratik dikirin. Li derva hevdu baş nas dikirin.

Bilo:

– Kekê, karê te çi ye li vira?

Beko:

– Ev hevalana ji komala tirkên bi navê.... ne. Ji bo komala wanan

operesyonek heye. Ez jî bi şaşitî wek ku endamê wê me, anîn vira. Lê tu?

– Ez jî ji bo wê operasyonê li vira me.

– Weng e, netirse. Tişteki min û te bi wan tune. Dixwaze çend rojan şuva min û te berdin. Lê ev hevalana nizanin. Kek Bilo, ya ez bêjim huro em jî û van hevalana jî, em dest dijmin de ne. Çi bikine, em ji niha de nizanin. Dixwaze em û ew hevalana pişt xwe bidin hev, çend rojan canê xwe di devê xwe kinî, li ser lingên xwe dawestî û li hember dijmin rûmeta xwe biparizî. Serkevinî. Dijminê me yek e. Dixwaze em jî yek binî. Van kûçikana pir îşkencê dikine. Çavên te netirsînim, lê ne tişteke ku însanetî qebûl bike.

– Tu meraq neke, kekê min. Mîna te gotî, tu girêdayîya me ya wê komalê tune. Dixwaze em bi rûmet ji vira bi derkevin.

Rojê çend caran hucre bi hucre girtîyên li wira yek bi yek dibirin di hingavtin, dûva dianîn wek laşan diavitin hucran û diçûn. Bêyî nan, bêyî av û bêyî xew bûn. Bixwazin jî

hetanî sibê ji ber nalînên bîrindaran xew nedikete çavên wan.

Ji wan çar hevalên tirk Erdem, her hevalekî di hucrê de ji îşkencê dihat: "Hevalno em, ji bo daxwazeke pir baş, ji bo xilasîya gelên tirk, kurd û herkesên ku li Tirkîyê dijîn, bi rê ketin. Ji bo li ser dinê û li her welatekî, aşitî azadî û wekhevîya însanetî û gelan em ketin rê. Huro jî em dest dijmin de ne. Dixwaze li hember wan em nekevin bin, dixwaze em bi ser kevin. Ji bo wê yekê berxwedan gerek e. Li ser lingan dawestîn gerek e. Îşkenceyên wana me natirsînin. Bawer im ew ê bi binkevin, serkeftin û pêşeroj ya me ye." digot. Waya jî heval pir motîve dikirin. Tim û tim jî dubare dikir. Çel û pênc rojan, di DAL'ê de wûn. (Dûva, Çûne Girtigaha Mamakê)

Di DAL'ê de her roj, wek hev û bi îşkencê derbas dibû. Dixwastin însanetî û rûmeta wan ji dest bigirin. Çend rojan şuva gardîyanek hat.

– Em dizanin hûn birçîne. Hûn vê rindîyê jî heq nakine, lê dilê me bi we dişewite. Em dixwazin, şîr bidin we. Wikas pere bidin, em ji we re şîr bistînin. Got. Pênc xortan, bi qasî ku wan xwastî pere dan. Ji hevalên tirk Alî, bê pere wû. Beko perê Alî jî da wî.

– Gardîyan, çû, saetekê şuva hat. Pênc şîr anî bûn. Di hucrê de şeş meriv hebûn. Beko:

– Hevalno, we dît. Me perê şeş şîran dayê. Aha, hûn dibînin pênc şîr anîne. Em şeş meriv in. Dijmin dîsa ya xwe kir. Me diceribîne. Xwarin, bi parvekirinê xwaş e. Di çêbûna zarokên cîranan de dema ku şîrê dîya wan tunebûya, dayîkên me şîrê pêsîrên xwe dida wan, şîrê pêsîrên xwe li zarokên xwe û wan parve dikirin. Ya hûn bizanin, him zaroyê xwe him jî yê cîrana xwe tev dimêjandin. Ma î dijmin bizane me şîrê pêsîren dayîkan li hev parve kirîye. Ma em nikanin şîrê pez û manga li hev par kin? Em ê pênc şîran di navbera xwe de bi şeş para kinî. Daxwaza wana vala biderxinînin. Bi av gotinên Beko re, Erdem şor girt:

– Na, hûn jî dizanin ez di îşkencê de me. Dijmin dixwaze ez ji gûcê de bikevim. Ez î li hember dijmin li ber xwe bidim, li ser lingan dawestim. Ji bo wê jî şîrê xwe ez ê bi xwe vexwime. Ez şîrê xwe parve nakim.

Not: Min tema vê hekatê ji kek Rifat İlhan girt. Mala wî ava be.

Payîzî

Seyfî Doğan

Axê zer! Tarlên zer! Rojê zer! Giyayên zer! Rengên payîzeyên zer ê huzurê didin min û dûne min fireh dikine. Ezî xwe ewle hîsdikime.

Hêşinî ye asûman ê nezikî min e. Destî xwe dirêjkim, ezê ewran wek singê gewr û zindî di dest xwe kim.

Dilê minî dixwazê, pêxas bimeşim. Qîrnîyê bi ser dûnê xim! Dûnê ji xewê şîyar bikim. Li ser pêlên avê hêşin û ewrên sipî biherikim. Meha îlonê, meha berhemên bereketê biharê û zengînîya xuyê hanîya ye.

Ezî îsal, li meha îlone li Xelika bûm. Jo bo ku li biharê baran û zivistanê jî berfê bol bû ye, mahsulê îsal, xelkê heremê gelek şa kiri bû.

Wexte ku heyî dibe, însanan toleransa xwe bilind û tehamîla ji bo fikren cuda fireh dibe. Însanî bi ruhekî vekirî li dûnê dinêre. Velhasil insanên îsal gurlex û coş bûn.

Jîyane minê li welatên dûr û welatên xerîb û xerîbîya min li sala 1964 wexte ku min, meha îlonê li Kulu yê dest bi orta okulê kir dest pê kir û hîn ji berdewame.

Wexte ku min li Kuluyê dixwand, ez jî wek hevalên xwe, bi hesreta gund bûm. Pir bîra gundî xwe dikir.

Bîra germîya axê xwe dikir. Germiya ku min xwe têda xwe ewla hîs dikir. Jîyanêke minê berdewamî û runîştî habû. Min xwe bi care kê re li boşligî yê kê xwe dît. Min li gund her însan nasdikir. Bes bi tenê ne insan. Min kuçik û çuçikên hemî gundîyan nasdikirin. Min hemî keçik, bûk û jinên gund nasdikirin. Sûlalên wanan dizanî.

Min dizanî ku roj ji kude hiltê û ji kude terê ava. Min bi zimanî ewran dizanî. Min barên ewren tehmîn dikirin. Min ji formasyonê ewran çeşît û çeşît wêne ava dikirin. Min tamê nanî ser selêyî germ dizanî. Min qûl û qewarên cîyanda xwe ji ber barane û berfe diparast. Min bi zimanî xwe deng kirin qulot dikir.

Min germiya û sermaye axê ku ez li ser digerîyam baş dizanî. Ronîyê cavên kecên kezî ez xenê dikirim.

Wendakirina keytane civakî û hisî pir zehmete. Xerîbî bi serî xwe kar û bare kî girana. Hesreta li şevên xerîbîyê bilind bibe û nefesê li însên teng bike. Hesreta, ruhî însanan teng û rasyonel fikirine kût bike. Şevên li gurbetê ê giranin. Marî bîrê axe xwe, bihnê xwarin û vexwarin, bihnê cîh

û waren xwe dike. Serpêhatîyên xwe
û welatê xwe li paş xwe cîhdihêle.

Ez û hevalên ku di gune min re
li Kuluyê dicûn ortaokulê, pir caran
rojê şemî, ji nîvro bi şunda dicûn ser
rîya gundî Xelika û bendê wasitan

dipa ku herin gund. Gelek caran,
em vedigerin mala xwe yê ku em li
Kulu yê tê da diman. Cimkî; ya va-
sita nedihatın anjî wasitên ku dicûn
gund em nedigirtin.

Carcaran jî em pêya dicûn gund.

*Bu kent peşini bırakmayacak. Aynı sokaklarda
dolaşacaksın. Aynı mahallede yaşayacaksın;
aynı evlerde kır düşecek saçlarına.*

*Bu kenttir gidip gideceğin yer. Bir başkasını umma,
Bir gemi yok, bir yol yok sana.*

Değil mi ki hayatını kıydın burada.

Bu küçük köşede, ona kıydın demektir bütün dünyada.

*Diyorsun ki, bir başka ülkeye,
bir başka denize gitmek istiyorum;*

*bundan daha güzel bir başka kent vardır kuşkusuz,
ama kötü yazgım peşimi bırakmaz ne yapsam,
ve kalbim gömülü bir ceset sanki burada.*

*Ruhum daha ne kadar katlanacak bu çoraklığa
nereye çevirsem yüzümü, nereye baksam
hayatımın kara yıkıntıları çıkıyor karşıma
bunca yıllarımı boşa tükettiğim şu ülkede..?*

*Yeni bir ülke bulamazsın, arama;
bulamayacaksın başka denizler de;
nereye gitsen bu kent ardından gelecek senin,
aynı sokaklarda dolaşıp duracaksın yine,
aynı hep aynı mahallede yaşlanacaksın,
aynı hep aynı evlerde ağaracak saçların
ve dönüp bu kente geleceksin sonunda;
yanılma sakın, bir başka şey umma,
seni bekleyen bir gemi yok, bir çıkar yolun yok...*

*Ömrünü nasıl tükettiysen burada, bu köşecikte
öyle kıydın demektir ona, bütün yeryüzünde.*

Konstantinos Kavafis*

Hevîyê min ew e ku ez dê rojakê, ji xerîbîyê xelas bibim.

Dema ku ezî li îzîné bûm, gelek caran cûm Kuluyê. Kulu yê pir hatîyê guherandin. Qalikê xwe yî tê guherandin. Hundirê xwe yî wek berêyê.

Însanan mejoyê xwe yî westîya yê. Nexwînine. Kûr nefikirine. Li ber her fikirên nujên astêngîyan dertêxine. Ji bo nûxwazîyan hewldan nakin. Empatî tune. Însanên pêşhîkmî ne. Mijarên mineqaşan, bira ci dibe ma bibe, zana ne. Kitêb û rojname naxwînin. Lê pisporên her babetê ne. Ekonimiyê, doktoriye, perwerdeyî velhasil, hertiştî dizanin lê karê ku pê re mujil, dibin baş nizanin.

Herder erebên teybêti. Cîhe ku erebê lê park bikî, nebînî. Tek û tûk hîn erebên hespên hene. Tê bîra min, wexte ku ez diçûm ortaokulê, tekerebecî kî li ser hespî xwe Apollo nivîsandi bû.

Li Kuluyê gelek xanîyên nu ava kirine û hîn jî ava dikin. Lê xanîyên bes ji beton û ji hêsi nin. Xanîyê bê tam û tik. Dema ku xanîya ava dikine yê keytanên bi jîyanê kevn re jî tehrîp dikine. Berdewamîyê mîrascandêye dibirine. Qutbûnekê di navbarê nêşîlan de çedibê û dibê sedema wendabûna hafîzayê kollektiv. Ew fenomena li her derê xuya dike.

Li ser kolanên mezin gelek dukanê zera difiroşin hene.

Kolan û kuçên ji kirîyaran tijî bûn. Însanên ji dukanekê dikevîne dukanekê. Di dest herkesekî da turikên naylonî habûn. Piranîyê kirdaran ê ji gundên kurdan bûn û bi kurmancî deng dikirin. Piranîyê gundên Kuluyê kurd in. Li ser kolanê mezin, gelek parsekçî habûn û piranîyên wanan jin bûn û hinekan ji wanan zarokên pir bi çucik kiribûn hembezên xwe.

Ez, xanîme min û baldûza min, em li kehve kê runiştî bûn û me cay vedixwar.

Min dît ku lawike kî zayîf û zîncavî berve me tê. Salan wî, min li dor deh salîyê hesap kir. Di destên wî da kodeke darinî, fîrcayek û şîmkeke ji naylon habû.

Lawik ku rind nezîkê me bû bi şîwe kurdî; *Amca ayakbilarini boyayım mı?*

Wexte ku lêwîk, ew pîrsa kir, min lawik temaşa dikir.

Pîrsa xwe wek bergerînekê bû. Cawên wî wek du kanîstankên ku avê xwe şelî bûn. Milên wî, ketî bûn ser singê wî. Suretê wî wek carîxa şivanê ku bi bayî bakûr û li ber rojê havînê zîva bû yî bû. Cermî ser destên wî mîna axê ku bi salan av nedîtî qalîştî û reş bû. Kincên wî qelêrî û dirî bûn. Merasêkî dirî di lingan da û serkot bû.

Lê, damarekê camêrîyê, bi qerar û

ronî di kûrîyê cavên wî da xûya dikir
û agirên arreng vediketin. Zîz û zîz
mêsdikir.

Kîjan bendên lî derîyê bahozên
dil û mejoyî wî bûn?!

Ezî dudilî bûm ku merasên xwe
bi wî lewîkî boyax bikim.

A yekê; ezî li dijî ku zarok kar
bikine me. Ez î dixwazime ku ew
bixwînin(bi zimanê make) û dew-
let mesrefe xwandinê wanan tedarik
bike. Her zarok, rewza ekonomîya,
de û bavan wanan ci dibe bila me
bibe xudîyê eynê heqan bin.

A dudî ya; nexwazim ku kesek
merasî min boyax bike. Ez de merasî
xwe bi xwe boyax bikim.

Min pere dan lêwîk û bi tirkî;

– Ayakkabıları boyamana gerek
yok. Sadece cilala

– Cila yok.

– Oldu. Al şu parayı cila ya da
gerek yok.

Ji bo ku niyête min zelal bike, biz-
dokî li çavên min kûr û kûr mêskir.

– Haram olmaz mı?

– Hayir ! haram olmaz! Kendi ri-
zam ile veriyorum. Hoş helal olsun!

– Nerelisin?

– Mardinli.

– Ailece mi Kuludasınız?

– Evet. Benim ailem, amcam ve
bir kaç komşu Kulu ya geldik.

– Baban ne iş yapar.



–Babam inşaatlarda çalışıyordu
ama şimdi evde yatıyor.

–Neden?

–İnşaatın ikinci katından düştü
ve ayağını kırdı. Annem çalışmıyor

–Evin masraflarını sen mı
karşılıyorsun?

–Ben ve kardeşlerim. Param
artarsa küçük kız kardeşime şeker
alıyorum.

– Kütürçe biliyor musun?

– Ben bilmiyorum ama annem
ve babam bilirler. Amca, Burası
Kulu! burada, ayakabı boyamak için
herkes Türkçe konuşur.

Stockholm 2011– 11– 30

*Konstantinos Kavafis, şairê Yûnanî yê bi nav
û deng e. 17 Nisanê 1863 hatiye dîne û li 29
Nisanê 1933 wegeriya dîne alî din.
Min ew helbesta ji întênete wergirt û navê wergêr
tune bû.

Du helbest

TEYRÊN AŞÎTÎYÊ

Baskên wana de
Hêvîyên dilbîrînan
Difîrîn li ban û bilindîyan
Teyrên aşitîyê
Ji bo azadî û biratîyê
Dilerizînin
Erd û ezmanan
Bahoz dîtîn
Natîrsin ji batîrsokan
Roja dîlan û govenda
Azadî û Rizgarî ye
Bigîrîn destê keç û xortan
Destekî min de aşitî
Destekî de azadî
Bî guhên we ve kim
Wan guharan.

Mem Xelikan

SÎLAV KÎN

Çîyan silav kin
Sîngê xwe li ber me vekin
Em zarokên Kawa ne
Me carek din paşila xwe de
Veşêrkin
Dehaq ne yek ne dudi ne
Ne çar û sisê ne
Ji xwarina mêjoyên me
Têr naxwine
Paşila wana
Mala bavanên min e
Kurd rijandina xwînê
Naxwazine
Çend hezar sal in
Rêwîyên azadî û aşitîyê ne
Lewma agirê Newrozê
Germ digirine.

Mem Xelikan - 2011

Asîmîlasyon û serhildana min

Muzaffer Özgür

Komara Tirkîyê ji salê 1950î bi şûn da, bi rêya avakirina dibistanan dest bi asîmîlekirina kurdên Anatolê jî kiribûn. Di destpêkê de li gundên mezin dibistan hatibûn avakirin. Hetanî sala 1960-65an jî li pir gundan dibistan hatin çêkirin. Di dibistanan da zarok bi tirkî hîn dibûn û jîyaneka nû ya bi tirkî ji bo wan ava dibû. Bi rêya dibistanê asîmîlasyona kurdan çêdibû. Di mejîyê zarokan de îdealîzma tirkan, hebûna tirkan, dîroka wan a mezin pir cîh digirt!.. Zarok wek leşkerekî dihatin perwerdekirin.

Li gundê me jî di salê 1960an da dewletê dibistan çêkiribû. Heta salên ez herim dibistanê jî pir zarok hatibûn perwerdekirin. Zimanê tirkî di nav gundê me de jî wek zimanê duyemîn e. Dema min dest bi dibistanê kir, min çend kelîme tirkî dizanîn. Dibistana gundê me bi sê çar pola bû. Me bi rastî di perwerdaya dibistana gundê me de zehmetîyên mezin dîtin. Meriv ji alîyê perwerdekirina zarokan ve, ji aliyê pedagojîyê ve mêze bike, bi rastî qirkirineka pir mezin ya kultur û jîyanê tê eşkerekirin.

Di jîyana nû ya dibistanê de bi zimanê dayîkê dengkirin qedexe

bû. Her dem di destê memoste da yan çu hebû yan jî ji bo zarokan aş bike, henekê xwe pê bike û li wan bixe tişteki din. Di Pola yekemîn da Memoste bi zimanekî xerîb, zimanekî nenas deng dikir. Ew tişteki eceb bû. Me zarokan jî li bejn û devê wî mêze dikir. Eger me kelîmeyek fahm dikir pir kêfa me dihat. Me digot em tirkî dizanin. Dema mamoste digot: *Kim adımı tahtaya yazacak?* Me bi tirs li çavên hevdu mêze dikir û çend kesan dest radikirin ku wan nîşan didan ku mamoste fahmkirine.

Meriv bi nivîsandinê nikan wan eşkere bike. Gelek jî zehmet e. Jîyana zarokên li dibistanê bi perwerdekirina zimanê tirkî dikete rêyeke nû. Bi çend salan bi şûn da jî zarok wek asîmîlebûyî bi ser diket, li dawîyê jî malbat û gel dibûn tirk!

Her çiqas zarokên gundê me jî wek zarokên gundê din bi tirkî hîn dibûn jî bi şiklekî baş hîn nedibûn. Ez dixwazim mîna keke binivîsînim.

Rojekê mixtarê gundê me li mala xwe ji bo memostê gund xarinekê amade dike. Ji nimeya nivro bi şûn da xwarin tê xwarinê û dema çay û qehwe tê, mixtarê gund bangê lawê xwe dike û dibêje:

– Here ber hevşoyê me mêze bike

ka pez û bizinên me hatine an na?

Xortê malê bi lez terê mêze dike û vedigere. Li ba memoste bi kurdî-zimanê dayîka xwe qedexe ye û mecbûr e di hundirê odê de bi tirkî deng bike. Lê nizane bi tirkî navê bizin û mîyan çi yê! Bêcare derîyê oda mevanan vedike û dikeve hûndire odê. Mixtarê gund bi tirkî ji lawê xwe dipirse:

– Te mêze kir, hemû hatine, kêmasî hene?

Lawê malê destê xwe li ser serê xwe wek kuteke digire (mîha tarîf dike) û dibê:

– *Baba böyle var.*

Paşê jî dest û tilîyên xwe li ser serê xwe wek surîyan direj dike (bizina tarîf dike) û dibê

– *Böyle yok.*

Hemû cemaata di hundirê odê de bi gotina lawê malê dikenin. Va gotina, pir salan di nav însanên gundê me de wek henek herdem tê ser ziman. Mînak ji salên 1965-1970an e.

Niha jî ez dixwazim mînaka xwe binivîsînim.

Ez bawer im havîna sala 1976an bû. Min dibistana li gundê me xelas kiribû. Rojekê em havalên wê demê di hevşoyê dibistane de bi gogê dilîstin. Memosteyê me wek hersal havînê dîsa li gund mabû û li gundê me kar dikir. Mamostê me hatiye mal û bi dizîkî li me temaşe kiriye. Dema lîstikê, me bi hevra bi zimanê

xwe kurdî deng dikiriye. Wan dengkirinên me bihîstine. Ji nişka va me dît ku mamoste li hevşoyê dibistanê sêra me dike. Got:

– Hemû werin cem min.

Me dest ji lîstika xwe berda û em li doralîyê wî gehîştin hev. Bi şikleki pozbilind got:

– Lo kerno, min bi we re negotibû bi kurdî dengkirin kedexe ye!

Ji ber tîrsa ketî canê me, me hemûyan li çavên hevdu mêze kir û em bi sûxar sekinîn. Nizanim çima cesaretek hate min û min got:

– Mamostê min, me dibistan xelas kir, em ê ji wê bi şûn da zimanê xwe bikanin deng bikin. Tu nikanî destdirejî me bikî.

Lawo ew çi gotin bû ji devê min derket, ma ji dervayî min tu kes tunebû bersiva mamostê pêda. Ji gotina min bi şûn da mamoste destê xwe avêt milê min û ez girtim. Bi şelmaqekê li min xist. Ew çi êş bû. Tilîyên wî wek mîxekî li ser sûretê min ketin. Zarokekî duwanzdehsalî bûm. Ez bigirî revîyam berva gund malê çûm. Lê kîn û nefreta min di serê min da pir mezin bû. Mamostê me di dema dibistanê de pir li me dida. Nefreta me li hemberî mamoste hîn jî zêde bû.

Min li mal qet behsa wê nekir. Ez lawê malê yî tenê bûm, pir delalî bûm. Dê û bavê min, xuşkê min, malbata me, merivê min qîmetek didan min. Min lêdan ji wan

nedixwar. Lê kesekî xerîb, kesekî bêwijdan û çoyê dewleta tirk di destê wî de bi kêf û dilê xwe li me dida. Ew lêdana pênc salan berdewam kir. Dema dibistan xelas bû em pir kêfxwaş bûn. Gelek kêfa me dihat ku êdi mamoste nedikanî li me bida.

Roj derbas dibûn Rojekê ez û çend havalên din çûn mizgefta gund. Di hundirê mizgeftê de hosta ji bo elektirîke lampê pewadikirin. Demeke em di hundirê mizgeftê de man û me alikariya mele kir. Paşê çend kes ji mezinên gund ketin hundirê mizgeftê. Di nav cemaatê de mamoste jî hebû. Dema em li ber çavê mamoste ketin bi hêrs bi destê xwe derî îşmar kir û got:

– Derkevin derva! Çi karî we li vir heye?

Em tirsîyan û em bi lez derketin derva, berva dukana gund çûn. Lê kîna min pir mezin bû. Ji koma hevalan bi dûrketim. Gereg bû ku ez li mamoste bixim. Le çawa? Zarok bûm. Quweta min tunebû. Li hemberî mizgefta gund, mala xalê min hebû, çûm ketim nav xarima mala xalê xwe. Li wir min berîkên xwe bi keviran çiji kirin û helkişiyam ser diwarê xarimê. Li benda mamoste bûm. Armanca min ew bû, dema mamoste ji mizgeftê derkeve ez ê bi keviran lêbidim.

Demeke bi şûn da mamoste ji mizgeftê derket û berva dukanê hat, ew li hemberî min bû. Min dest bi

şerê xwe kir. Kevir ji berîkên xwe derdixistin û wek baranê li mamoste didan. Wî nedikanî bireve, ketibû şokê. Destê xwe dabûn serê xwe û bi dengekî bilind nalenal bû. Dema avêtina keviran xelas bû, wî ez dîm. Min jî ji ser xarimê bazda û bi lez berva mal rewîyam.

Dîya min li ber malê karê xwe yî rojane dikir. Dema ez bi lez û bê solix direvîyam, got:

– Çir bû, kî aserê te dike, te bi havalên xwe re hing kir?

Hîn min bersiva dêya xwe nedabû ji aliyê mala apê min de mamoste xûya kir. Destê xwe dabû ser serê xwe û bi lez berva me dihat. Dêya min mat mabû. Min fahm kir ku eger ew bigêje min ê li min bide, ez berva paş mala me rewîyam.

Dêya min qet bi tirkî nedizanî, mamoste ji dêya min re hekata min digot. Min li paş harima me li wan mêze dikir. Çend kesan jî dabûn pê mamoste hatibûn mer mala me. Dêya min digot:

– Avekê bidim te, rûne, çir bû, mamoste? Çexe cemaatê dibû digot:

– Hûn bêjin çir bû bi qurbana we bim, lawe min çi kir? Wan di nav hevdu da deng dikirin.

Paş mala me, cîhe me yî xermana bû. Ji gundekî cîran merivekî dêya min hersal dema xermana dihat alikariya me dikir. Remo, dîsa li ser karê xwe bû. Dema ez dîtîm, bezîya û got:

– Çi bo lawo? Ew helehela te çi ye?

Dema hate kêleka min, min xwe avête paş Remo. Wî dûrê dûr mamoste û cemaat dît. Min got:

– Min serê mamoste şikand, ew dixwaze li min bixe. Remo serê xwe ba kir û got:

– Hiii, ma tirkek li cem min li te bixe! Bi şeref ez ê bi dîrganê zikê wî bidirînim.

Bi lez çû sêguh (dîrgan) li ser xermanê heyne û bangê mamoste kir:

– Mamoste, de ez li benda te me. De were ka kî şêr e, ma va gunda bibîne.

Însanên li ber mala me hatibûn hev, mamoste girtin, misade nekirin ku berva me bimeşe. Ketin pîyê wî ew heyne birin malê.

Ev mesela min li nav gundê me demekê hate ser ziman. Însana ez pesandim. Min jî xwe wek mezinê didît, pir kêfa min dihat. Ez bûbûm qehreman.

Ji wê meselê bi şûn da min qet bi mamostê xwe re deng nekir. Em li hemberî hev natin. Demekê bi şûn da jî ji gundê me çû bajarê xwe Adanê.

Car caran ji min re xeber dişand, digot:

– Min penç sala mamostetîya wî kir. Heqê min li ser wî heye. Di îslame de tê gotin ku: kesekî bi min herfekê hîn bike ez ê çel salî bibim

kolê wî. Min qet ji Muzaffer ew heqereta çavne dikir.

Min jî xeber jê re dişand ku tu heqî wî li ser min tune. Fedekarîya wî kir wezîfa wî bû. Li gor wê jî ji dewletê maaş girt. Lê eger kesek ji me li heq bigere, heqê min hîn zêde bi ser wî de heye. Min pir salan, şîrê pez û mangên me, min heg û nanê sêlê ji wî re birin. Pê ra bêjin: li dunya din ez ê ji bo zulma li dibistanê li me kir, ez ê bi qirika wî bigirim.

Ma hîro rewş ketîye halekî din. Asîmîlasyon bi şikle nû berdewam e. Me kurda çi li welat çi li bajarên Tirkîyê an jî li Anatolîyê pir dert û kul dîtin. Ez niha bi zimanê hatî kedexekirin, bi kurdî ji we re hekata asîmîlasyonê dinivîsim. Em bi ser ketin lê kar û barê me hîn jî pir e.

Ferheng:

Bîranîn: Anî
Komar: Cumhuriyet
Dibistan: Okul
Zarok: Çocuk
Dîrok: Tarih
Leşker: Asker
Perwerde: Eğitim
Qedex: Yasak
Jîyan: Yaşam
Pol: Sınıf
Nivîsandin: Yazmak
Mamoste: Öğretmen
Gel: Halk
Amade: Hazır
Mînak: Örnek
Mizgeft: Camii
Mele: İmam
Kom: Grup
Armanç: Amaç
Sêguh: Dirgen

Cuciye serî kênî çûlê


Xamgelî Bane

Ve nûşko vîriska ra lê. Cûciye le ban dare re nav hêlîne ociniqîya. Firê vindiriyaw vî ow rûje. Dengi vîriska je asirmangel ve qîje qîj rihat. Cûciye le ban hakeli xwê çêwgele vokird. Girdivere têrîko vi vî. Ke vîriska ve hêvend çiqes kirde qîje qîj jî cûciye ne destê je hakel vî, ne jî rake şewetêrik vî nerivîrist ke je hêlîne viderkefî. Diya vîriska varanî ve guje guj kirde xar. Dare ke cûciye le banê vî dari çortik vî. Dari çortikel pên û gewra. Hêlini cûciye re bini pelkel vî. Rave varane le cûciye û hêline nerikeft. Cûciye çêwgele qurcand û le bini dengi varane û vîriska ve xw-evo çî.

Cûciye çêwgele vokird. Gordi vokirdandine rî ke je varane û vîriska şew tiştî nemaye. Viçe vîçi cûciyeli dik je nêzik û dûr xweş xweş rihat. Kênîyê hendi dare ve şure şur diherîkîya. Cûciye şa vî ke suvaye pêko vîye. Cûciye je ban hakel esta û firîya ban kurni kênîye. Kurni kênîye je kuçik hativîye xaskirdin. Seranser veyek vestîyaw je sî çêw hativîye yirtin. Ey kênîye le çûle dûri dîyel vî. Le seri riçi herikani avi kênîye peşêş

dari cîyi cîyi hevi. Dari vî, dari gûç, dari berû, dari rîxok, dari momax û ey darê çortike vî. Darê çortike je dargeli dik him gewretir vî, him jî pîr vî. Yekî jî darê hendi kênîye vî. Cûciyel rake hêlîngelîyan naye vîrandin le ban dargeli gewre û pelk firîye xasê rikirdin. Ey hêlîne jî je ew hêlîngel vî.

Je xaro rênî pes rake av vixerî vervi kênîye rihat. Seyeli ve zilqi pese gaveke cûciye le ban kurni kênîye vî îyan ve seri kênîye. Cûciye ke seyel dî, firîya ban dare. Je ban daro seyeli seri kênîye çêw rikird. Seyel je kurne av xardin. Diya av xardine le hendi kênîye mexola hatin. Şivane ve kero hate ser kênîye û tîre û paliki kere nave ban zinêrê biçîkê lay piştîyi kênîye. Duvajû ve û çona pese vervi kurni kênîye riran. Nîya pese dusî nêrî û bizini ma rê vî. Verangelî nav rêne rikeftine ban mîyel. Duvajûve çûve birdi verangel kird. Pese kem kem ve qor vervi kurni ave rihat. Yêke avê xwê rixard dira ve la. Ve ris rêne gî ve av kirdin. Şivane vervi leverî nav gore pese bird. Ke şivane û pesgel çî seyel jî ra lê le diya rêne kal



kal kefte rû. Cûciye je ban daro pese, seyel şivane û yêdikel gî çêw kird. Îngirîke kênîye û xwê disan ve teyna ma. Je ban daro firiya xar dîsan. Ve nukil heyî av xard. Jê dîyaw kefte vîrê ke xêrî firsîyo vîye. Vervi rêne firîya ra lê çî. Şûnake rêne lê rileverîye kemî bin av vî. Ow şûngele ke binav vî kirm û buxiki bini xake lê firê rihate vîrandin. Cûciye le nav rêno le şûngeleke mîyel pa rinanlê kirm û buxikele riderkefte navça. Cûciye ve nukil rîkaşay û ridaqurtandê. Ke zikê xas vîye çekme, firîya ra lê çî.

Le seri kênîye na. Cûciye û kênîye weki du hamîrî vîn. Je hamirîye ûrotir du biraki xas vîn. Cûciye çen saleke le bani ey darê hendi kênîye çêlik rikird. Daliki ey cûciye jî eyî lire le ban ey darê çortike le ey hêlîne ge-

wro kirdi vî. Daliki dalikîyan jî enco. Rave navberi ey kênîye û cûciye qeri dari çortike firê tişt dê hevî.

Cûciye girdi dîyer heyî lîla lola firîya. Ke vindirîya ve dîyaw çerxi ban dare vî. Hat ke le seri kênîye jin û mêrdî nîştiye. Mêrike le ban leverî jori kênîye dirîjo vîye. Jine jî le lay xariy kaniye je dar û sergîn navî lê. Je kaniye dûye rielat. Bani koze patîle lê vî. Deri patîle derikî lê vî ra ve navi batîle ke çe lê rihate birşandin dîyar nerîra. Bûyî xweş girdivere elgirt. Mûz, mûrî û buxikel gî gurdo vi vî. Mêrike gordi jine qise rikird le şûni xwê. Jine konî elxist le ban leverê. Bani kone heyî nan û tiştimişt navê. Jine him kar dikird, him jî gordi mêrike qise kirdine rinand. Je nav qato guranîyî re demê vî.

”Nêvû nêvû le dile qorî nêvû,
Weki tami dile jî tamî cîyî nêvû,

Yekî ke ve dili xwê nezevicîya,
Şewe lê rûjnayî nêvû,

Ke mirarit îyave yek, Jexere weki
esel lêt tê rivû”

Le dengi jine mêrike jî dengi xwê
ve eynî qeyro tevi dengi jine rikird
û guranîye gordiyek xilas kirdin.
Dîyar vîke ey mêrike û jine ve dili
xûyan zevicîyaw vîn. Salîyan gewre
dîyardira. Lê berê weki xort û azew
gişte giştîyan vî.

Jine pilyele elmand û patile je
ban koze na. Le ban kone ke elxistî
vî nay ve navrastê. Mêrike je şûni
xwê esta û çîye seri kênîye. Je çuriki
kênîye ve mişt rû xwê sîçar çar av
kird lê û şûşt. Du sî jî qulp av fir
kird û ra lê çîye seri nane. Jine je tora
nane derxist û heyî vervi mêrike ra.
Jine û mêrike ve kenîy û qejmerî nan
xardin û tişte gurdo kirdin. Heman
ke neçîvîn dîsan ve mişt je kênîye av
xardin û vervi diyê xariye ran lê çîn.
Cuciye je ban daro hetake mêrike û
jine je veri çêw mêk vî girî. Ew gi-
randine cûciye ribirde heyî şûni cîyî
cîyî. Je naw serê hezar tişt dixericîya.
Xwê ve teyna vî. Le ban darî çortik
le çûle. Sî hakê re nav hêlîne, yekî jî
kênîyî veherikan le hendê vî. Kênîye
hamirîyê en xasê vî. Kênîye he ke
riherikîya dengi ave ke rikeftle avi

nav kurne dengi şure şurê rihat. Ey
denge vîşê kênîye zîndiyo rikird. Ke
eco neva jî ve cûciye eco rihat.

Yên hewa zemîye giran giran
weki her ruj dîsan têrîko riviya. Vîşê
yekî dest rinare qirtiki cûciye. Ow
qese ruhê tengo riviya. Erê ve şew
jî mêvani kênîye hevî. Ve şew rake
çêwgelê nerivîvand û nerifirîya ow
qere je şewe hez nerikird. Ke ruyîyî
yan marî elperîkîya dare xwê û
hakelê ra vixarda. Ve rûj tiştî enco ve
serê vihata canî xwê ra xilas vikirda.
Ey zerastîye ra şew enco nevî. Xwê
ve teyna le ban dare heta ke suvaye
pêko riviya le nav hêlîne rixeft. Rave
cûciye firê xweşê ve têrîke û şewe
nerihat.

Je ow şewgele şewî cûciye re nav
hêlîne ve qaleqîrî ve xwê hesîya.
Cûciye çêwgele vokird. Rîke vervi
seri kênîye çar penç xort arîyay. Şewe
ve şewqi mange weki rûj vî. Zarûvel
ve kergelo hatine seri kênîye vistan.
Xortgel je tîre ve qixeqix peşex mir-
gi sax derxistin. Yekî mirgel je tîre
riderxist, yekî jî seri mirgel di el-
piçiqand. Duvan jî kozî ariy navîn lê
û tenikey nîme piri av kirdin vîn. Avi
tenika germ dikirdin. Ke ave ve pilqe
pilq xas kulîya mirgel ve pûrti mûrto
avîştine nav tenika. Mirgel heyî re
nav avê kulîyave ke vista ve diyaw
mirmgel je paçikelo girtin û yek yek

ve pûrt û çermi mermo şeşitandinê. Mirgel rût kirdin. Le hendi ariye çale ke kûlîn bal û pûrte ve çermo kirdin dûre. Ke çerm kirdine xilas vî bani çale piri xak kirdin û banê pûşandin. Ve pa ban çale dewsandin û je kênîye dusî tek av avirdin elpişandine ban xake. Dîsan ban çale dewsandin û heyî xaki din elpişandine bani o girdivere. Jila jola heyî qirşî qal gurdo kirdin û bani çale ve eyeno voşardin. Dusîyan jî heya ke eyane çale pûşandin gûşte le ban koze birşand. Gî gordiyek le gûşte gurdo vîn û iznaqelê ran ve seyeli hendeke avirdivîn. Ve qaleqîr, guranî qejmerî nêziki destî suvayzi ran lê çîn je seri kênîye. Hetake xortgel çî cûciye tîkî xew re çêwê nekeft. Zatî dilê nevî ke vixefî. Qale qîr û vaje vajî cîyî le bini darê le seri kênîye hevî. Ey tiştê cîyîye bî xew îştivîyê, dîsan jî vê xweş hat.

Ve dengi motîrgeli naw teleyelo ve xwê hesîya. Vervi dîyê xariy firîya. Le seri çeme dotgel û vevîyel cil û xilîf dişûştin. Şûnikel de destîyan ve tepe tep riranle geltgel. Heyî jin û dot xurî û caviye ri kutan. Dotgel qali şûkirdine û qeline rikirdin. Heyî leyane goranî kird û ra lê vervi ban dîye çî. Ve balgelo xwê verda vervi xar. Ke îyave nav dîye rî ke dargeli qevaxel û vîyel gî aribirin. Bani

dargeli navi dîye piri cûciyî cîyî cîyî vî vercê. çêw yerdand ke cûciy vînî nerî. Bûbikel, cûciyeli du nukil, qijik denay nerî. Heyî dari rût mavî le nav harimi dîye heva. Cûciye ke eyene rî, xêrî toxamişê vî. Xemê navê ve nuşko firê vî. Vervi seri kênîye cî îcare. Navçê dîyer û şîme vî deme. Seri kênî dîye xewlet vî. Le ey vextgele seri kênî dîye piri vevî, dot û jin divîya. Ser le ser diqelivîya. Tu bo ke şênatî seri kênîye weki yê verceyîn nevî. Cûciye ke dargeli birandin û xewletî seri kênîye rî jema ke ra ey rûjeteyna enco ra vû heva. Rûjgeli dik tim le ov gavgele hate nav dîyê xariy ke eynîkestin. Cûciye eye çen saleke her rûj, re rûje du sî car di hate ey dîye, qe tiştî enco nerî vî ve çêwgeli xwê heta îgave. Vîşê ewrî sê le ban ey dîye gurdo vîvî û qe dilê nevîke viçû. Tiştî weki yê verceyîne nevî. Dargeli nav dîye hativîye birandin. Seri kênî dîye xewleto vî vî. Eye rançe enco rivîya ? Je xwê pirsî. Heyî dik ban dîye yerdî û firîya ra lê çî ve hêlînê xwê.

Le ban kurni kuçikê kênîye na û ve nukil hebar av xard. Vîrê le dîyê xariy vî. Race le ew dîye enco rivîya. Le ew dîye race ruçime diogorîya. Heyî tişt ke cûciyel fexmê nerikird divîya. Cûciye ke çiqes le seri kênîyî çûl hêlînê heva jî, destê je dîyel û

dargeli nav dîyel nerivîya. Dêy ke dar lê nevî cûciy jî lê ne ri vîya, dêy ke vevî û dot lê nêvî xort jî lê nê nerivîya, zarû jî lê nê rivîya. Dêy ke cûciy û dot lê nevî qe bira nevîya.

Avê xwê ke fir kird ve dîyaw, firîya nav hêlîne. Hakel hativîye demi qurxe. Cûciye weki verceyîn hakel firê ve teyna neritanist ke vîšta. Jê verceyîn firêtir dale ban hakel va ke vişeliya û çêlikel peyda va. Cûciye heva keftivîre qurx. Re rûje cay teyna riçîya zike tîr dikird û rihat.

Suvayzîyî je nav galiki hakel çêlikel derkeft. Sî çêlikê vî ve cayko. Dalîkîyan diçîya rayan kirm û buxik

davird û ve xavindîyan dikird. Rûj ve rûj çêlikel gewro rivîyan û yên pûrt digirtin. Balgelîyan zeqê firê rivîya.

Rûjî cûciye çêlikeli xwê birde seri kênîye. Ra çêlikel qali kênîye kird ke çend sale ale hendî ey kênîya û daliki xwê jî ewî lire gewro kirdiye. Temê le çêlikeli xwê kird ke îwe jî lire çêlikelitan gewro vikerin. Ey dareke hêlîneman jî arîye mîngangeli ma dalikimane. Çêlikel jî xweş go ravîn ve seri qiseyeli dalike. Çêlikel rake heman bîçik vîn xas nerifîrîyan. Heva le girdi kênîye teyna rîfîrîyan. Le nav û girdi hêlîne le bendi dalike rivistan ke zike tîr vikerin.



Cûciye ke je dîyel je yerdîne hat le seri kênîye marî sê rî. Le seri kênîye le ban kuçîkî pê n mare totik oxardi vî. Cûciye ke mare rî şerpeze vî je tirs. Margel dijminê cûciyele. Him jî ey dijmine cûciyel zeqê neritanist. Cûciye ve bidizî bî deng û hes firîya çî ve nav hêlîne. Je ban daro le mare ringirîya. Vî şalam mare ve xwê vihesî û jîre viçû. Ke dîya nîmerû siri germe şîkîya mare giran giran xwê çimand. Quwd dirave xwê. Mare sere je nav totike ke oxardivî bilindi jor kird û le girdivere girî. Kefte navi avi kurne û germi canî xwê re nav ave îşt. Je naw kurni ave derkeft û çêw le dargel yerdand. Darê en nêzikê kênîye darê en gewra vî. Le dargeli dik jî firê pelk û pirçik îjne vî. Le ban darê çortike hêlin hevî. Lê berê le jor vî, yekî jî je xar dîyar nerira. Mare hêlini cûciye nerî, vervi dargeli dik çî. Îngirî û rîke le ban dargeli dik jî tiştî lê nî ve dîyaw hate seri kênîye. Je joro dengî zîli seyel hat. Seyeli rêngel vervi kênîye rihata. Mare ke dengî zîli seyel îya vê kefte bini zinarê biçîkê hendi kênîye. Seyel hatin je kênîye av xardî û heyî mexelo vîn. Je dîr şivane kirde voşte voşt û seyel ve xardan danlê çîn. Zemîye yê têrîko rivîya. Cûciye je tirsî mare nerivîrist ke hêlîne vîlî û viçû. Tirsê firîyê ra şew vî. Enî ke mare ve şew elperîkîye

dare û re xeve xwê û çêlikelê vixwerî.

Gave ke seyel çî, nêzîki dîyer vî. Dotî û kurey ve xardan hatine seri kênîye û xûyan le piştî kuçîki kênîye voşardîn. Îngirî n ke kesî îjnî le bini dare mirarîyan îya veyek. Lûre vîne jinimêrdî yek. Dote çiqinê xwê vokird û jê heyî tiştî xardin derxist. Veyni kure jê xardin. Kure û dote qal dikirdin. Ke dildariyekin. Erake ma boyiki dote dewlemend vîye ve kure nerayinê. Çen car gewretirgeli dîye êrdandiyine serê dîsan dili boyîkê nevîye. Kure jî hewa xênce vayan-dine rûyey nerîye. Dote ke çiqinê xwê gurdo kird, kure çî ve hendi zinarê biçîke dirîjo vî. Dote jî le hendi kuçîke nîşt. Kure le hendi marê sîye dirîjo vi vî. Kure le şuni xwê xirman-ço vî. Re nav qato mare çî ve hendi kure û nave bini kefelê. Du sî car je şûni cîyî nave kure, kure esta pa û mare rî ke nayeve. Mare xuşîya kefte bini kuçîke. Dote û kure ve biraw biraw keftin veyek. Xwê mirdaro kird dote. Neritanist ke ve dîyaw viçin ve dîye. Le ban çoki dote xorte can da. Je dîyê xariy le ban sî hesp duşîyanî ve çarpa vervi kênîye rihatin. Cûciye û çêlikelê je ban daro je nav hêlîno ewane çêw rikirdin. Hesp gel hatine seri kênîye ke xweyşîkîyan gordî kure ke vayîye alura. Ka xweyşîkîyan şivîn dikerî. Birangeli dote je dote tiştî ne

pirsîn û ve dancayelo nan ve kurê mirdiye û dote. Xunê kure û dote tevi rengi avi kêniye vî le nav kurne. Ey dildargele verci birangel marê siye destîyan jeyek kirdi vî. Vervi diye ve çarpa ranlê çîn siwargel. Gordi dengi dança diye vervi seri kêniye elîşiya. Seri kêni çûle ve biraw biraw û hawar hawar dudengo vî. Jingel ve dilo kêniye jî kirdin de girî. Avi kêniye he ke jingel dilo riçirîya firê rivîya.

Her sî çêliki cûciye re nav hêline je tirs ve dalike çewsîkiyan. Çêlikel heman firê biçîk vîn. Tîşteke ve çewgeli xûyan dîn ra ewane firê ve tirs vî. Dalîkiyan jî heman tîşti enco nerîvî. Gaveke rîke rengi avi kêniye soro vî hewa fexm kird ke lîrgele risqe elatiye. Cûciye rîke kêniye jî rîyîrî, zanist ke kêniye zîndiye.

Le diyê xariy dargel hativîye birandin. Seri kêni diye dot û vevî lê nemayî. Le seri kêni çûlgel margeli sê mirari dildargel sê rikird. Birangel şivînî xweyşikel nerinasîya. Marê siye heman de bini zinare, birangel de nav diye cirît rikird. Ey tîştgele şanandinî heyî tîşt vî. Ke çûn vikirday jî ey zerastîye heva le navça vî, ve her lay ki xwê.

Cûciye gordi çêlikele qise kird ke heva lîre nîyaye vîstandin. Suvayzî

